

▲ KÜRD xalqı mübariz və qəhrəman xalqdır Heydər Əliyev

DİPLOMAT

№ 31 (543) 16 - 22 Avqust, Tebax sal. il 2023
Ji meha şubatê sala 2003-a tê weşandin

Həftəlik İctimai-siyasi qəzet
Rojnama heftename civakî û siyasî

Qiyməti: 40 qəpik
Həjəye:

Bilirsən, nə etmiş kürdlər bir zaman? Qədim Avropanın xaçpərəstləri, Müsəlman keçmişin öyrənsə əgər,
Qurtarmış İslamı çox ağır dardan! Yüz illər sındırmış göy məscidləri. Kürdün dərgahına daim baş əyər.

Səbāhəddin Eloğlu

SEROKÊ HÊJA, BRÊZ MESUD BARZANÎ, 77 SALÎYA WE PÎROZBÊ!



İlham Əliyev Davosda İraq Kürdüstan Regional hökumətinin başçısı ilə görüşüb

18 yanvar 2017-ci il tarixində Prezident İlham Əliyev Davosda İraq Kürdüstan Regional Hökumətinin başçısı Məsud Bərzani ilə görüşüb. Prezident İlham Əliyev xalqlarımız arasında tarixi, mədəni əlaqələrin olduğunu qeyd edərək Məsud Bərzaninin atasının vaxtilə bir müddət Azərbaycanda yaşadığını xatırladı. Məsud Bərzani atasının xatirəsini yad etdiyi üçün dövlətimizin başçısına minnətdarlığını bildirərək atasının Bakı ilə bağlı xatirələrini hər zaman məmnunluqla yad etdiyini vurğuladı. Görüşdə Azərbaycan ilə İraq Kürdüstan Regional Hökuməti arasında energetika, ticarət, idxal-ixrac və digər istiqamətlərdə əməkdaşlıq imkanlarının araşdırılmasının mümkünüyü qeyd edildi. Məsud Bərzani İraq Kürdüstan Regional Hökumətinin Azərbaycan şirkətləri ilə müxtəlif layihələr üzrə əməkdaşlıqda maraqlı olduqlarını bildirdi, əlaqələrimizin genişləndirilməsi üçün yaxşı imkanların mövcudluğunu vurğuladı.



Em desteya rojnama "Diplomata Kurd" û "Yekitiya Civata Kurdên Azərbaycanê" bi dil û can, bona 77-salıya cenabî Serokê hêja, **Mesud Mistefa Barzanî** û 77- salıya damezirandina **PDK-ê** pîroz dikan, Serokê hêjara li jîyanê can saxî, emrê dirêj, li sîyasetê serkeftin û li malbetê bextewariyê ji Xudayê mezin û dilovan hîvî dikan. Û hîvîyame ji Serokê hêja ewe wekî zutirekê mizgînîya Kurdistanê Serxwebuyî bide gellê kurd û Kurdistanê. Her bijî.

Bi hurmet û rêz: Tahir Silêman, sernivîsarê rojnama "Diplomata kurd" û serokê "Yekitiya Civata Kurdên Azərbaycanê"

Prezident İlham Əliyev Koreya Xalq Demokratik Respublikasının Azərbaycanda yeni təyin olunmuş səfirinin etimadnaməsini qəbul edib


Jîyan û bi serhata azadîkarê gelê kurd Gêneral Mistefa Barzanî

Jîyan û serhatda Serok Mesûd Mistefa Barzanî

UNUDULMAYAN ŞAHMALI KÜRDOĞLU

DÊMOKRASİYA CENABİ MESUD BARZANİ HÊJAYİ XELATA NOBÉLÉYE

16 августа – дата основания ДПК и день рождения ее лидера, Масуда Барзани



Səh. 6

Şêx Abdülislam Barzanî û Dewleta Kurdistanê û Otonomî û Dewleta Federe ya Kurdistanê...



Səh. 4

Mesrûr Barzanî: PDK herdem di parastina qeware, xak û mafên gelê Kurdistanê de pêşeng e



Səh. 5

DÊMOKRASİYA CENABİ MEŞUD BARZANİ HÊJAYİ XELATA NOBÉLÉYE



Səh. 12

Nêçîrvan Barzanî: Şanazî ye ku PDK heta niha jî bi germî di meydana xebatê de ye û nûnertiya gelê Kurdistanê dike

Prezident İlham Əliyev Bakıda "Diamed" dərman istehsalı zavodunun açılışında iştirak edib

Azərbaycan Respublikasının Prezidenti İlham Əliyev Bakının Pirallahı rayonunda "Diamed" dərman istehsalı zavodunun açılışında iştirak edib.

İqtisadiyyat naziri Mikayıl Cəbarov və "Diamed Development Group" MMC-nin təsisçisi Aytən Quliyeva dövlətimizin başçısına görülən işlər barədə məlumat verdilər.

Layihənin əhəmiyyəti barədə videoçarx nümayiş olundu.

Qeyd edək ki, qeyri-neft iqtisadiyyatının inkişafı və sənayeləşmə Prezident İlham Əliyevin iqtisadiyyatın şaxələndirilməsi siyasətinin əsas istiqamətlərindəndir. Bu baxımdan iqtisadiyyatın digər sahələri ilə yanaşı, sənayenin inkişafına xüsusi əhəmiyyət verilir, mövcud təbii və iqtisadi resursların istehsalda cəlb edilməsi, qabaqcıl texnologiyaların daha geniş tətbiqi istiqamətində sistemli tədbirlər həyata keçirilir.

Ölkəmizdə sənayeləşmə siyasətinə uyğun olaraq ixtisaslaşmış sənaye parkları və sənaye məhəllələri yaradılır. Hazırda ölkəmizdə 7 sənaye parkı (Sumqayıt Kimya, Qaradağ, Pirallahı, Mingəçevir, Balaxanı, Ağdam və Cəbrayıl rayonunda yerləşən "Araz Vadisi İqtisadi Zonası" sənaye parkları) və 5 sənaye məhəlləsi (Hacıqabul, Masallı, Neftçala, Sabirabad və Şərur sənaye məhəllələri) mövcuddur. Sənaye parkları və məhəllələrdə sahibkarlıq fəaliyyətinin inkişafı üçün əlverişli investisiya mühiti yaradılıb.

Sənaye parklarının rezidentləri qeydiyyatla alındıqları tarixdən etibarən 10 il müddətinə əmlak, torpaq, gəlir və ya



mənfəət vergisindən, istehsal məqsədilə idxal etdikləri texnika, texnoloji avadanlıq və qurğular isə ƏDV-dən və gömrük rüsumlarından azad olunurlar. İndiyədək sənaye zonalarında 134 sahibkarlıq subyektinə rezidentlik statusu verilib və bunlardan artıq 68-i fəaliyyətə başlayıb. Sahibkarlar tərəfindən bu günədək sənaye zonalarına 6,56 milyard manatdan çox investisiya yatırılıb və 10 min 600-dən çox daimi iş yeri yaradılıb.

Dövlətimizin başçısının müvafiq Sərəncamı ilə əczaçılıq məhsullarının istehsalı sahəsində ixtisaslaşmış Pirallahı Sənaye Parkı da yaradılıb. Bu günədək parkda 6 müəssisə rezident kimi qeydiyyatdan keçib. Onlardan "R-Pharm" MMC və "Diamed Co" MMC artıq fəaliyyətə başlayıb. Rezidentlər tərəfindən 36,6 milyon manatdan çox investisiya yatırılıb, 130-dan çox iş yeri yaradılıb. Növbəti mərhələdə 30 milyon manat investisiyanın qoyulması və daha 250-dən artıq iş yerinin

yaradılması nəzərdə tutulur. Bu sənaye parkının rezidentləri tərəfindən indiyədək 37 milyon manatlıq məhsul istehsal olunub.

Ölkəmizdə müasir sənaye müəssisələrinin, yeni istehsal sahələrinin yaradılması nəticəsində daxili tələbatın ödənilməsində yerli məhsulların payı əhəmiyyətli dərəcədə artır, ixrac imkanları genişlənir. Belə müəssisələrdən biri də "Diamed Development Group" MMC-nin Pirallahı rayonunda yaradılan dərman zavodudur. Bir hektar ərazisi olan zavod 3 min kvadratmetr qapalı sahədən ibarətdir.

Qeyd edək ki, Prezident İlham Əliyevin Sərəncamı ilə 2006-cı ildə fəaliyyətə başlayan "Azərbaycan Investisiya Şirkəti" Açıq Səhmdar Cəmiyyətinin yaradılmasının əsas məqsədi mövcud və yeni kommersiya müəssisələrinə yerli və xarici investorlar cəlb etməklə və öz vəsaiti hesabına müddətli investisiya qoyuluşları

vasitəsilə ölkəmizdə iqtisadiyyatın qeyri-neft sektorunun inkişaf etdirilməsidir. Şirkətin fəaliyyətinin əsas prioritetləri birbaşa investisiyalar və yeni texnologiyaların Azərbaycana cəlb edilməsi üzrə katalizator olmaq, ölkəmizdə qeyri-neft sektorunun inkişafına töhfə vermək, habelə iqtisadiyyatın şaxələndirilməsi və idxalı əvəzləyən proseslərə dəstək verməkdir. Şirkət fəaliyyəti dövründə 27 layihəyə 224 milyon dollar investisiya yatırılıb. Bu layihələrin 11-i xarici tərəfdaşlarla birgə icra olunub.

"Azərbaycan Investisiya Şirkəti" ASC bu dərman zavodunun tikintisinin maliyyələşdirilməsində də iştirak edib. Ümumi dəyəri 15,6 milyon manatdan çox olan "Diamed" dərman zavodunda "Azərbaycan Investisiya Şirkəti"nin payı 20 faizdir.

Bu müəssisəyə dövlət tərəfindən digər dəstək tədbirləri də göstərilib. Belə ki, layihənin reallaşması üçün İqtisadiyyat Nazirliyinin Sahibkar-

lığın İnkişafı Fondu tərəfindən 6 milyon manat güzəştli kredit verilib. Sahibkarlığın inkişafına digər bir dövlət dəstəyi çərçivəsində İqtisadiyyat Nazirliyi tərəfindən verilmiş investisiya təşviqi sənədi sayəsində müəssisə idxal etdiyi avadanlıqlara görə 1,3 milyon manat güzəşt əldə edib.

Prezident İlham Əliyev zavodu işə saldı.

İstehsal prosesi ilə yaxından tanış olan dövlətimizin başçısına məlumat verildi ki, zavodda müxtəlif adlarda, geniş çeşiddə (NaCl 0,9 faiz; Ringer; Ringer laktat; qlükoza və s.) və müxtəlif həcmərdə (100 ml, 200 ml, 250 ml, 400 ml, 500 ml) həyati vacib və zəruri venadaxili dərman məhsulları istehsal olunacaq. Müəssisənin illik istehsal gücü 20 milyon litrdir. Qeyd olundu ki, ölkəmizin bu dərmanlara olan illik tələbatı isə təxminən 15 milyon litrdir. Beləliklə, müəssisədə istehsal edilən məhsulların yerli bazarın tələbatını ödəməsi ilə yanaşı, Rusiya, Gürcüstan və Orta Asiya ölkələrinə ixracı da nəzərdə tutulur.

"Diamed" dərman zavodunda 100 iş yeri yaradılıb. Müəssisənin layihəsi İsveçrə şirkəti tərəfindən Qabaqcıl İstehsal Təcrübəsinə (GMP), istehsal xətti isə Avropa Farmakopeyasına uyğun olaraq hazırlanıb. Yüksək texnologiya və tam qapalı sistemlə təchiz edilmiş zavodun istehsal avadanlıqları İtaliya, ABŞ, Almaniya, İsrail kimi ölkələrdən alınıb. İstehsal olunan məhsullar zavoda məxsus müasir laboratoriyada Avropa Farmakopeyasının tələblərinə uyğun mütəmadi olaraq yoxlanılır.

Prezident İlham Əliyev Koreya Xalq Demokratik Respublikasının Azərbaycanda yeni təyin olunmuş səfirinin etimadnaməsini qəbul edib

Avqustun 18-də Azərbaycan Respublikasının Prezidenti İlham Əliyev Koreya Xalq Demokratik Respublikasının ölkəmizdə yeni təyin olunmuş fəvqəladə və səlahiyyətli səfiri Sin Xon Çxolun etimadnaməsini qəbul edib.

Səfir etimadnaməsini Prezident İlham Əliyevə təqdim etdi. Sonra dövlətimizin başçısı səfirle söhbət etdi.

Qəbula görə dövlətimizin başçısına təşəkkürünü bildirən səfir Koreya Xalq Demokratik Respublikası Dövlət Şurasının Sədri Kim Çen İnın salamlarını Prezident İlham Əliyevə çatdırdı. Prezident İlham Əliyev salamlara görə minnətdarlığını bildirdi, onun da salamlarının Koreya Xalq Demokratik Respublikası Dövlət Şurasının Sədrinə çatdırmağı xahiş etdi.

Azərbaycanın Qoşulmama Hərəkatına uğurlu sədrliyi münasibətilə təbriklərini çatdıran səfir xalqımızın Ümummilli Lideri Heydər Əliyevin 1985-ci

ildə Koreya Xalq Demokratik Respublikasına səfirinin məmnuniyyətlə xatırladığını bildirdi. O, Azərbaycanın və Koreya Xalq Demokratik Respublikasının beynəlxalq təşkilatlar çərçivəsində uğurlu əməkdaşlığının vacibliyini vurğuladı, iki ölkənin parlamentləri, eləcə də Yeni Azərbaycan Partiyası ilə Koreya Xalq Demokratik Respublikasının Əmək Partiyası arasında əməkdaşlığın inkişaf etdirilməsinin önəmini qeyd etdi. Sin Xon Çxol Azərbaycanın neft-qaz sahəsində zəngin təcrübəsini nəzərə alaraq, Koreya Xalq Demokratik Respublikasından olan tələbələrə Azərbaycanda bu sahədə təhsil almasının vacibliyini diqqətə çatdırdı.

Dövlətimizin başçısı ölkələrimiz arasında əlaqələrin qarşılıqlı maraq doğuran sahələrdə gələcəkdə də inkişaf edəcəyinə əminliyini bildirdi. Ulu Öndər Heydər Əliyevin 1985-ci ildə Koreya Xalq



Demokratik Respublikasının səfirini xatırladan Prezident İlham Əliyev bu səfirin sonrakı illərdə - Ümummilli Liderin müstəqil Azərbaycana rəhbərliyi dövründə Koreya Xalq Demokratik Respublikası ilə əlaqələrin inkişafına təkan verdiyini qeyd etdi. Prezident

İlham Əliyev Qoşulmama Hərəkatının 2019-cu ildə Azərbaycanda keçirilən Zirvə görüşü çərçivəsində Koreya Xalq Demokratik Respublikasının yüksək səviyyəli nümayəndə heyəti ilə görüşünü məmnunluqla xatırladı, Qoşulmama Hərəkatı, BMT və digər

beynəlxalq təşkilatçılar çərçivəsində ölkələrimiz arasında əlaqələri diqqətə çatdırdı.

Dövlətimizin başçısı parlamentlər, hakim partiyalar arasında münasibətlərin və mədəni əlaqələrin genişləndirilməsinin vacibliyini vurğuladı.

Jîyan û serhatda Serok Mesûd Mistefa Barzanî

Mesûdê kurê Mela Mistefa Barzanî di 16-ê tebaxa 1946-an de li bajarê

Şahê Îranê û Hikûmeta Iraqê li sala (1975), bi rênimayiya cenabê Mela Mistefayê Barzanî, Mesûd Barzanî li gel Îdrîs Barzanî birayê wî û jimareyek li hevalên xwe pêkve helsan bi rêxistina rêzên pêşmerge û damezrandina serkirdayetiya demkî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê ji bo dakokîkirina li kurd û Kurdistanê û di 26-ê gulana 1976-an şoreşa gulana dest pê kiriye. Di sala 1976-an heta 1979-an de Mesûd Barzanî li gel bavê xwe li Amerîkayê jiyaye û



Mehabadê li Kurdistana Îranê, li ber sîhê alaya Kurdistanê û li roja damezrandina Partiya Demokrat a Kurdistanê ji dayik bûye. Li serdema temena kurt ya Komara Kurdistanê li Mehabadê ku yekemîn giyana serbixwe ya kurdî bûye.

Piştî rûxana Komara Kurdistanê di sala 1947-an de, binemaleya Mesud Barzanî li gel komek li pêşmergeyan û binemala wan naçar bûn vegerin Kurdistana Iraqê û paşê li aliyê rejîma Iraqê ve hemû bo bajarên xwarê Iraq hatin dîrxistin, bi taybetî Bexda û Besre, lê belê Mela Mistefa Barzanî, bavê Mesud Barzanî, rêberê şoreşa kurd li gel hevalên xwe berbi aliyê Yekîtiya Sovyetê bi rêketin û heta sala 1958-an li wir man. Mesûd Barzanî bi sedema hokara siyasî û peywendiya bi şoreşa Îlonê xwendina navendî



temam nekir û Bexdayê bi cîh hişt û li temena 16 salî di sala 1962-an de çek hilgirtiye û çûye rêzê pêşmergeyê Kurdistanê û roleke wî berbiçav hebûye. Li

nehem a Partiya Demokrat a Kurdistanê bi awayekî demokrasiyane Barzanî Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê hate hilbijartin. Rola her yek li Mesûd Barzanî û Îdrîs Barzanî yê birayê wî, gelek berbiçav bûye di salên 1980-ê, heta wekî 1987-an de li damezrandina çendîn komeleyên siyasî li Iraqê û bi taybetî ku, bereyên Kurdistanê li çendîn rêxistin û hizbên Kurdistanê damezrand.



şoreşa kurd ku di 11-ê Îlona sala 1961-ê de bi rêberiya Mela Mistefa Barzanî destpêkir û heta sala 1975-an berdevam bû. Li jêr rênimayî û piştgîriya bavê xwe têkilîya xebata siyasî bûye. Barzanî jiyana xortaniya xwe terxan kiriye ji bo wan armancên ku Partiya Demokrat a Kurdistanê bilind kiriye. Di sala 1961-ê de, demokrasî ji bo Iraqê û Otonomî û paşê Federalîzm ji bo Kurdistanê li çarçêweya Iraqê demokratîk da, rêzdar xebatekî mezin ji bo vê çareseriyê rasteqîne kiriye.

Barzanî li temena bîst salî da bi awayekî rêk û pêk têkilî karûbarê siyasî bûye û di sala 1970-ê de beşdarî wê fîma kurdî bûye ku gûftûgoyê li gel Hikûmeta Iraqê, li ser rêkeftina otonomî kiriye. Di sala 1971-ê de li dema sazkirina kongreya heşt Partiya Demokrat a Kurdistanê bi sîfeta endamê komîteya navendî ya partiyê hatiye hilbijartin û paşê bûye endamê yedegê mekteba siyasî û erkê berpirsiya dezgeha emnî girtiye stûyê xwe.

Piştî ruxandina Şoreşa Îlonê li encama rêkkeftinnameya Cezayîrê li navbera

Barzanî teror kirine 32 kes le endamên malbata wî li gel wan 8000 Barzanî bûn ku ji aliyê rejîma Bees ve di sala 1983-an de hatin enfalkirin. Mesûd Barzanî xwedî çendîn hewldanên terorê bûye bi taybetî hewlên terorkirina li Vîyana paytexta Nemsayê di 8-ê çîleya 1979-an.

Barzanî û ji malbata xwe gelek qurbanî li ser kêşeya kurd daye û li dawiya li dayik bûnê heta 12 sal bavê xwe nedîtiye, ku ew li dûrî welat li Yekîtiya Sovyetê dijiya. Sîxurên rejîm sê birayê

Barzanî teror kirine 32 kes le endamên malbata wî li gel wan 8000 Barzanî bûn ku ji aliyê rejîma Bees ve di sala 1983-an de hatin enfalkirin. Mesûd Barzanî xwedî çendîn hewldanên terorê bûye bi taybetî hewlên terorkirina li Vîyana paytexta Nemsayê di 8-ê çîleya 1979-an.




Rejîmê Iraq yek li dawiya yekê (16) çar gundê barzaniyan xera kiriye ku gundê birêze, Barzanî pirtûkekî li ser rola dîroka Mistefa Barzanî bavê xwe li Tevergera

Neteweya Kurd li jêr navê Barzanî û Tevergera Rizgarîxwaziya Kurd ku li sê bergan pêk hatiye nivîsandiye, li gel çendîn gotar û babetên siyasî ku li rojname û kovarên Kurdistanê hatine belav kirin. Piştî şerê hevpeymaniyên dijî bi Iraq, Barzanî hem ahengî bereya Kurdistanê kir û serkirdayetiya raperfina adara 1991-ê kurdan kir ku bûye hoya azad kirina beşekî mezinê Kurdistana Iraqê ji deste rejîma Bexdayê.

Di meha nîsana 1991-ê de gûftûgo li gel Bexdayê dest pê kir û Barzanî ji bo çendîn mehan serokayetiya şanda kurdî kir ku li hemû hizbên bereya Kurdistanê pêk hatibûn. Li gûftugoyan bi hîç encamek negihîştin bi sedema redkirina daxwaziyan kurd ku birfî bûn li otonomî herêmeyê û demokratîzekirina ji aliyên Iraqê ve. Her wiha li kongreya 12-ê ya Partiya Demokrat a Kurdistanê di sala 1999-an de Mesûd Barzanî serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê careke din hatiye hilbijartin. Mesûd Barzanî li salên nohtan û heta weku ji navçûna rejîma Bees, beşdarî çendîn kongre û civînên navdewletî kiriye. Wekî civînên Washington li sala 1992-an û paşê li 1993-an û likongreya Selahedîn a 1992-an û kongreya Londonê ya Îlona 2002-an û kongreya Selahedîn a şubata 2003-an. Barzanî roleke xwe yê serekî li sercem pêşhatiyên siyasîyê Iraqê nû da hebûye, paşê li damezrandina Encûmena hukimrana Iraqê di 31-ê tîrmeha 2003-an, ku têda bûye endam û dawiyê jî bûye serokê encûmenê.

Di 12-ê hezîrana 2005-an de Mesûd Barzanî wekî yekemîn serokê

çendîn welatan bi seredanên fermî kiriye û çendîn serokê welat û serokwezîrê van welatan dîtiye, li encama van hevdiyan de li gel serok George W. Bushserokê Amerîkayê di 25-ê cotmeha 2005-an de û Tony Blair serokwezîrê Britanya di 31-ê cotmeha 2005-an de û papayê Vatîkanê



di 14-ê mijdara 2005-an de û Silvio Berlusconi serokwezîrê Îtalyayê di 13-ê mijdara 2005-an de û Abdullah keyê Erebiyê di 13-ê adara 2007-an de û Abdullah keyê Urdunê di 19-ê adara 2007-an de. Wekî serokê herêmê ji bo geşkirina hevpeymanî li nav hêzên siyasîyên Kurdistanê çend organeke damezrandiye û li herêmê proseya biryardanê baştir kiriye:

- Li roja 22-ê kanûna 2007-an Encûmena Serokayetiya Kurdistanê hate damezrandin ku têda serokê herêmê ser-



herêma Kurdistanê ji aliyê Encûmena Nîştîmanî ya Kurdistana Iraqê ve hate hilbijartin.

Mesûd Barzanî li hilbijartinên roja 25-ê tîrmeha 2009-an bi rêjeya 70% ê denggan bi destxist û bi awayekî raste rast ji aliyê gelê Kurdistanê ve duyemîn car

pereştiya civînan dike, û cîgirê serokê herêmê Kosret Resul li gel serokê Parlamena Kurdistanê û serokê Hikûmeta Kurdistanê û cîgirên wan û serokê Dîwana Serokayetiya Herêmê. Heya niha berdevamîya Serokatîyê Kurdistanê û sîyasetmedarê aramîya Rojhilta Navine.

- Encûmena bilinda Partiyên siyasîyan, ku kesayetiya yekem a partiyên siyasîyan têda endam in, ku ji van hizbên xwarê ve pêk dihê: Partiya Demokrat a Kurdistanê, Yekîtiya Nîştîmanî ya Kurdistanê, Partiya Zehmetkêşên Kurdistanê, Partiya Sosyalîst a Demokrat a Kurdistanê, Yekgirtîya Îslamî ya Kurdistanê, Komeleya Îslamî ya Kurdistanê. Serok Barzanî şeydayê xwendinê bi taybetî jî hez bi xwendina pirtûkên dîrokî û siyasî û serbazî dike û her wiha gelek hez ji werzîşê dike. Mesûd Barzanî sala 1965-an dest bi jiyana hevjiyê kiriye û xwedî heşt zarokane. Barzanî şarezayî bi temamiya zimanê kurdî û erebî û farisî ye, her wiha şarezayî zimanê îngilîzî ye û dikare pê biaxibe.

Amadekar: Tahir Silêman

77. SALVEGERA DAMEZIRANDINA PDKÊ



Serkevtin bo rêbaza Barzanî, rêbaza kurdewarî û Kurdistanîtiyê.

Serkevtin bo stratejiya dewletbûnê.

Bi van hest û hêviyan pîroz be 77. salvegera damezirandina PDKê û 77 saliya rêzdar Mesûd Barzanî ku îroroj ew pêşeng û pêşmergeyê rêbaza Kurd û Kurdistanîtiyê û stratejiya dewletbûna Kurdistanê ye.

"Peyama Serok Barzanî ya bi helkefta 77. salvegera damezrandina Partiya Demokrata Kurdistanê

Bi navê xwedayê mezin û dilovan

Bi helkefta hatina şanzdehê teboxê û bîranîna heftih û şeşemîn salvegera damezrandina Partiya Demokrata Kurdistanê, germtirîn pîrozbahiyê li malbatên serbilindên şehîdan û Pêşmergeyên qehreman û hemû kadîr û alîgir û cemawerê Partî û hemû xelkê Kurdistanê dikim.

Li bîranîna Şanzdehê Teboxê da peyama min ji bo cemawer û alîgir û endamên Partî eweye ku Partî(PDK) partiya doz û bihayane û şopa rêbaza Barzanîyê Nemir û cihê hêviya xelkê Kurdistanê ye. Ji bo wê yekê pêwîste hemû kesên partîyî li asta meziniya dîrok û qurbanîdana partiya xwe û xwîna şehîdan bin û divê erkê xwe bi baştirîn awayî encam bidin ku xizmetkirin û bihêzkirina Kurdistanê ye. Daxwaz ji hemû Partîyîyan dikim îrade û hêviya wan bihêz bê ji ber ku Partî îrade û hêvî û hêze ji bo hemû xelkê Kurdistanê.

Mesûd Barzanî

16ê Teboxa 2022"

Ji rûpela Baregehê Barzanî / Barzani Headquarters /

ی ئازراب ی آنگه راب

16. August um 09:50

Serok Barzanî li Akrê û Berdereşê guhdariya xelkê kir



Serok Mesûd Barzanî li navçeyên Akrê û Berdereşê bi xelkê re civiya û ji nêzik ve guhdariya pirsgerêkên wan kir.

Berpîrsê Rêxistina PDKyê ya navçeya Akrê ragihand ku armanca serdana Serok Barzanî ew bû ku ji nêzik ve guhdariya xelkê bike û ji daxwaz û gazinên wan agahdar be.

Serok Barzanî çû navçeya Akrê ya Dihokê li avahiya Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) bi çend kesayetiyên navdar, berpîrsên îdarî û endaman re civiya.

Di civînê de Parêzgarê Dihokê Elî Teter, Serokê Rêxistina PDKyê yê Dihokê Piştîwan Sadiq, qaymeqamên Akrê û Berdereşê û rêveberên partiyê amade bûn. Serok Barzanî demjimêr 16.00an li Salona Konferansê ya Akrê bi xelkê navçeyên Akrê û Berdereşê re civiya. Piştî axaftina xwe guhdariya daxwazên welatîyan kir, civîn ji çapemeniyê re girtî bû.

Nerina Azad

Mesrûr Barzanî: PDK herdem di parastina qeware, xak û mafên gelê Kurdistanê de pêşeng e

Cîgirê Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) Mesrûr Barzanî di 77emîn salvegera damezirandina PDKê de, peyameke pîrozbahiyê belav kir û tê de got: "Partî hizba li histgirtina berpîrsiyartiyên mezin û bihêz ragirtina îradeya Kurdîstaniyan e"



Deqa peyama Cîgirê Serokê PDKê Mesrûr Barzanî:

"Di 77mîn salvegera damezrandina Partiya Demokrata Kurdistanê û salvegera ji dayikbûna Serkirde û Rêberê niştîmanî cenabê Serok Mesûd Barzanî, gerimtirîn pîrozbayî pêşkêşî cenabê Serok, tevahiya endam, alîgir, dostên Partiya Demokrata Kurdistanê, malbet û kesûkarên serfiraz yê şehîd û enfalkirîyan, Pêşmergeyên qehreman yê Kurdistanê û tevahiya Kurdîstaniyên niştîmanperwer dikim.

16ê Teboxê tenê ne salvegera damezrandina partiyê kevnar û pêşeng ya Kurdistanê ye bi Rêberatiya bavê Rihê netewî ya me Mistefa Barzanî ye, belku, hemdem bîranîna debistaneke mezin û biheybet ya Kurdatî, niştîmanperwerî xwe neçemandin û berevanî kirine ji mafên reva yê gelê Kurdistanê bi tevahiya pêkhatiyên cuda cuda ku, heta niha jî berdewam e li ser xebat, qurbanîdan û têkoşîn û her tim di eniya herî li pêş ya berevanî kirin ji pêgeh, xak û mafên gelê Kurdistanê ye.

Partî hizba dayîk û şoreşên mezin û destkeftiyên mezin e, xwedan dîrokeke tîje ji serfirazî, serwerî û Serokekî Pêşmerge ye ku, jiyana û temena xwe bo berevanî kirin ji keramet, serfiraziya gel û niştîman û şikoya Kurdistanê terxan kiriye.

Partî ti carî hizbeke deverek anjî navçeyêke diyarîkirî ya Kurdistanê nebûye belku, ji roja damezrandinê ve tevahiya sînoren navçeyî derbas kiriye û bûye tevgerê girseyî ya Kurdistanê û berevanîkarê bihêz ya destkeftiyên niştîmanî, buhayê azadî, demokrasî û Parêzerê bihevne jiyana li Kurdistanê ye.

Partî hizba li estû girtina berpîrsiyartiyên mezin û bihêz ragirtina îradeya Kurdîstaniyan e û heta îro berdewame li pêşengî û pêşrewayefî kirina xelkê Kurdistanê bo parastina pêgeha niştîmanî û destûrî ya herêma Kurdistanê û pêşxistin û geşe pêdana karwana awedanî û wejandina Kurdistanê.

Di vê bîranîna bi heybet de birêzdarî û wefadarî ve damezrênerê partî, Rêberê dîrokî û bavê rihê Netewî ya xwe Mistefa Barzanî û Serkirdeyê şehîd Îdrîs Barzanî û tevahiya şehîdên rêya azadiya Kurdistanê bi bîr tînin.

16 Teboxê li tevahiya Kurdîstaniyan pîroz be
Mesrûr Barzanî
Cîgirê Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê"


Nivîsa min a kurdî ya hefteyî di ê de...

PDKê û Birêz Mesûd Barzanî ji bo neteweya kurd fenomen û aktorên dîrokî ne

16ê Teboxa 1946an de di şertên ku Komara Mehabadê ya Kurdistanê ava bibû, Partiya Demokrat a Kurdistanê Iraqê (PDK) hat damezrandin û Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî jî hat dinyayê. Di wê demê de çet nedihat bîra siyasetvanê milî yê Kurdistanê û rewşenbîrên Kurdistanê ku ew herdu bûyer dê bibin du fenomen û aktorên girîng ya dîroka neteweya Kurd û Kurdistanê. Ji bona ku birayê Şêx Ebdulsalam Barzanî Mele Mistefa Barzanî damezrêner û serokê partiya PDKê bû, bi awayekî dihat tahi min kirin ku PDKê dê di dîroka Kurdistanê û neteweya Kurd de bibe fenomen û aktorek girîng. Lê kesî tehmîn nedikir ku Birêz Serok Barzanî dê mezin bibe û di zarotriya xwe de li cem bavê xwe di Şoreşa Neteweyî ya Îlonê de bibe pêşmergeyekî leheng, berpîrsiyar û serokê PDKê yê çalak, bibe serokê Kurdistanê û bibe damezrênerê Dewleta Federe ya Kurdistanê.

PDKê piştî ku ava bû, temena Komara Mehabadê ya Kurdistanê dirêj nebû. Berya ku Komar encama êrîşa Dewleta Kolonyalîst a Îranê bê rûxandin, bi daxwaza Serokkomarê Dewleta Kurdistanê, Serokê Neteweyî Mele Mistefa Barzanî û 500 hevalên xwe jî derbasî Yekîtiya Sovyetan bû. Loma jî PDKê fiilên ji serokê xwe bêpar ma. Lê PDKê xebata xwe domand. PDKê di bin serkereteriya giştî ya Hemza Ebdûllah de, di nav gel de bi hêz bû. Serokatiya partiyê li hemberî êrîşa Hikûmeta Navendî ya Iraqê, berxwedan û hostetiyêke mezin nişan dan. Gel li hewirdora PDKê civiyar û li hemû dever û bajar û bajarokên Kurdistanê rêxistinên nihênî û veşartî hatin ava kirin. Di nav ciwan û rewşenbîrên Kurdistanê de bûn xwediyê hêzekê û îtibareke mezin qezenç kirin.

PDKê dema tê damezrandin gorî standartên dinyayê ava dibe. Piştî Şerê Dinyayê ya 2emîn dema ava dibe, dawî faşizma Hîtler tê dayin. Demokrasî li hemberî faşizm û otorîterîzmê tê pejirandin. PDKê jî, rêbaza neteweyî û demokratîk dipejîre. Loma jî demokrasiye li



İbrahim GUÇLU
(www.ibrahimguclu21@gmail.com)

Iraqê wek sîstema siyasî dê pejirandin. Loma jî, ji bona Kurdistanê Otonomiyê û ji bona Iraqê demokrasiye wek şiyar û armanç qebûl dike. PDKê biryar dide ku ji bona li Kurdistanê Ortonomî ava bibe û jiyana otonomiyê domdar be, divê demokrasi li Iraqê pêş bikeve û bibe terza (babeta) jiyane û çanda otorîter-nîjadperestî bê guhertin.

PDKê bona ku standartên navneteweyî pejirandibû, bi dinyaya demokratîk ve jî, li hev kirî bû.

Di sala 1958an de dema ku Serokê Neteweyî Mele Mistefa Barzanî û hevalên xwe piştî Şoreşa Abdulkêrîm Kasim vejeriyar Iraqê û Kurdistanê; PDKê, bi projeteke merzin vejeriya. Li Iraqê makezagonê nû çêbû. Di makezagonê hat pejirandin ku Iraq jî neteweya Kurd û ereban ava bûye; li Iraqê zimanê Kurdî û Erebî Fermî ye. Li Kurdistanê dê hukmî zatî ava bibe. Ew rûdawan dibin sedem ku PDKê xurttir bibe, li hemû Iraqê û li Kurdistanê bibe xwediyê rêxistinê. Li Payitexta (serokbajarê) Iraqê Baxdayê, Kongreya xwe aşkere li dar bixe. Bi deh hezaran kes beşdarî kongereya giştî ya PDKê bibe.

Dema ku Hikûmeta Navendî ya Iraqê, makezagona hatibû qebûl kirin, naxist jiyane û dest bi êrîşên kolonyalîst û dagirkerî kir, PDKê di bin serokatiya Serokê Neteweyî Mele Mistefa Barzanî de gelek bi hêsanî dest bi Şoreşa Neteweyî ya Îlonê kir. Di encamê de jî, zora Dewleta Iraqê bir û Hikûmeta

Navendî ya Iraqê û Baasê mecbûr bû ku ji avabûna Otonomîya Kurdistan re "erê" bibêje.

Dema ku Hikûmeta Navendî ji bona ku Otonomîya Kurdistanê têk bibe dest bi êrîşê kir, PDKê, dîsa gelek bi hêsanî li hemberî Rejîma Baasê Şer kir, gelek serkeftî bû.

Dema ku PDKê û Serokê Partiyê Mele Mistefa Barzanî dît ku li Kurdistanê qetlîfameke mezin tê çê bibe, dest ji şer ber de.

Ev helwesta partiyê jî diyar kir ku partî ji bona gel û berjewendiya gel heye. Ji derveyî berjewendiya gel, serokatiya partiyê û Serokê Neteweyî Mele Mistefa Barzanî, ji bona elîta partiye şer nake.

Lê dema PDKê derfet dît û şert pêk anîn, di sala 1975an de dest bi Şoreşa Neteweyî ya Gulanê kir. Wê demê pêşmerge Mesûd Barzanî bû serokê Şoreşê û ciyê Serokê Neteweyî Mele Mistefa Barzanî û bavê xwe dagirt. Stêrka wî birikî. Wî Rêbaza Barzaniyan meşand.

PDKê û YNKê, Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî û Celal Talabanî Dewleta Federe ya Kurdistanê ava kirin. Birêz Mesûd Barzanî jî bû Serokê Kurdistanê.

Loma jî dikarim bibêjim ku PDKê û Serok Barzanî di dîroka Kurdistanê û Neteweya Kurd de fenomenek û aktorekî girîng in.

Kurdan û dinyayê bi Serokê Kurdistanê û PDKê bawerî anî.

PDKê û Serok Barzanî di vêqonaxê de jî, ji bona Dewleta Federe ya Kurdistanê gelek girîng in. Bes ew dikarim li hemberî êrîşên dewletên dagirker, rêxistinên terorîst yê wek PKKê û Haşdî Şabi rawestin. Mala Kurdan biparêzin.

PDKê û Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî garantiya serxwebûna Kurdistanê ne. Ew dikarim ji encama referandûma serxwebûna Kurdistanê re xwedî derkevin.

Di salvegera damezrandina PDKê de, silav li damezrênerê PDKê û rêberê neteweya me nemir Mistefa Barzanî û Îdrîs Barzanî û hemû şehîdên Kurdistanê û Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî pîroz dikim.

DÊMOKRASÎYA CENABÎ MESUD BARZANÎ HÊJAYÎ XELATA NOBÊLÊYE

Îro li Bakûrê Kurdistanê û Tirkîyayê "Pirsgireka kurd" li rojevêdaye.

Hokumeta Tirkîyayê, bona zext û zora gelên kurd, ji sazîyên YA-ê, yê herf girîng ji sîstêma Başûrê Kurdistanê, ji dêmokrasîya rêzdarê hêja, Serokê Kurdistanana Azad, Cenabî Mesud Barzanî minaq hildane û hes dikin hine gavên dêmokrasîyê bavêjin. Lê nijatparêzên tirkîkan hemu gavan astengîyan derdixîne hole û bê şerm ji "bratîyê" gilf dikin. Lê çîrokên kalên xweye nijatparêziyê kevnar hes nakin ji bîra xwe derînin, axatîya xwe ji dest berdin. Daxazîya wana, kurda wek herdem bi çavên piçûk dîtine. Lê ew hes nakin pêşketina kurda qebûl bikin, hes



netewe kurd tunene evana tirkê çîyanin. Lê pêş van hemu buyeran, Serok Mesud Barzanî navên me tûrkmanan xiste lîsta parlamêntoya Îraqê û cara ewlîn ew em derxistine rêzên netewa. Beqî dêmokrasîya Barzanî em ketine Parlamêntoya Kurdistanê û xadî hemu mafên mirovahîyê bûn. Em hezdar cara kek Mesudra dibêjin spas`.

Belê, dewleta Tirkîyayê ber sîyaseta Mesud Barzanî teyax nekir, xwe nexaze jî hat di gel cenabî Mesud Barzanî, ber alaya Kurdistanêye sê rengîn rûnişt û ji Serokê hêja harîkarî xwast. Niha li Tirkîyayê nuneratîya Hokumeta Herêm hatîye vekirin, Ala rengîn li civat û meşada resmî tê bilind kirinê.

Eve sîyaset, eve Dêmokrasîya Barzanî, neyar nexaşîya xwe anî ber pîyên xwe wekî harîkarîyê bidin "Pirsgireka kurd".

Ji ronahîya Dêmokrasîya Mesud Barzanî li Kurdistanê çiqas netewa kêmjimar hene, heqê dêmokrasîya wan hatî dayîn. Ereb, tûrkman, surîyanî, kildanî, asorî, ermenî kîjanî ku li Kurdistanê deh hezarin li parlamêntoyê cîk hatîye dayîn.

Em gumanin Şewqa Dêmokrasîya Serokê hêja cenabî Mesud Barzanî wê ronahî bide Rojhilata Navîn û dewletên cîhanê.

Rastî jî Rojhilata Navîn, wusa jî dewleta Tirkîyayê, Sûriyayê, Îranê ber sîstêma dêmokrasîya Mesud Barzanî bixwazin jî, nexwazin jî hes dikin gavne dêmokrasî bavêjin.

Raste di sala 2004-a, cara ewlîn ez çûnê Kurdistanana Azad serkarên sazîyên tûrkmananva min hevdiîn çêkirin.

Ew digotin:

"Ji sala 1993-a gênêralên Tirkîyayê me bi balafirava dibirine Hekarîyê, qerergeha eskerîyê. Plan proqrama didane ber me. Yê ewlîn ew bû wekî, pîrsa Kurdistan neynîne ser zimanên xwe, kîjan tûrkman pîrsa Kurdistan bide xebatê ew ne tûrkmane.

Yê duyem, ala Kurdistanê qebûl mekin û neynin ser zimanê xwe.

Yê sêyem, ewe parlamêntoya Kurdistanê nas nekin û nebîne endam parlamênto.

Yê çarem, kurda cîrantîyê mekin, kî keça kurda lawên xwera stendîye bidin berdan, kê keça xwe daye kurdan paš bînin. Pêwîste hun bizanibin li cîhanê

netewe kurd tunene evana tirkê çîyanin. Lê pêş van hemu buyeran, Serok Mesud Barzanî navên me tûrkmanan xiste lîsta parlamêntoya Îraqê û cara ewlîn ew em derxistine rêzên netewa. Beqî dêmokrasîya Barzanî em ketine Parlamêntoya Kurdistanê û xadî hemu mafên mirovahîyê bûn. Em hezdar cara kek Mesudra dibêjin spas`.

Belê, dewleta Tirkîyayê ber sîyaseta Mesud Barzanî teyax nekir, xwe nexaze jî hat di gel cenabî Mesud Barzanî, ber alaya Kurdistanêye sê rengîn rûnişt û ji Serokê hêja harîkarî xwast. Niha li Tirkîyayê nuneratîya Hokumeta Herêm hatîye vekirin, Ala rengîn li civat û meşada resmî tê bilind kirinê.

Eve sîyaset, eve Dêmokrasîya Barzanî, neyar nexaşîya xwe anî ber pîyên xwe wekî harîkarîyê bidin "Pirsgireka kurd".

Ji ronahîya Dêmokrasîya Mesud Barzanî li Kurdistanê çiqas netewa kêmjimar hene, heqê dêmokrasîya wan hatî dayîn. Ereb, tûrkman, surîyanî, kildanî, asorî, ermenî kîjanî ku li Kurdistanê deh hezarin li parlamêntoyê cîk hatîye dayîn.

Em gumanin Şewqa Dêmokrasîya Serokê hêja cenabî Mesud Barzanî wê ronahî bide Rojhilata Navîn û dewletên cîhanê.

Serokên dewletan wê ji Dêmokrasîya Barzanî minaq hildin û tevî neteweyên kêmjimarên Kurdistanê, ji Sazîyên Cîhanê daxwaz bikin wekî, bona anîna haştî û azadîyê Xelata Nobêlê bidine Dêmokrathez, Haştîxwaz û Sîyasetmedarê mezin cenabê Mesud Mistefa Barzanî.


Amade kar: Tahir Silêman

Barzaniyê Nemir, diwartirîn xebat.. Bihêztirîn rêber

Mistefa Barzaniyê Nemir di 14.3.1903 li Barzan jidayik bûye.. Di sê saliya xwe de ji ber helwesta

Nemir bergîriyêke pir bi bandor hat kirin û di encamê de destpêka Adara 1975 rêjîm di şerê xwe de

netewî û azadîxwaz a malbata xwe ligel dayîka xwe dikeve zindanê.. Di 19 saliya xwe de serkirdatiya hêzeke barzaniyan dike ku diçin bo piştevaniya şoreşa Şêx Mehmûd Hefîd li Silêmaniye.. Di sedeya derbasbûyî de beşdar dibe û rêbertiya 7 şoreşên rizgarîxwaz ên Kurdistanê dike, ew jî şoreşên barzaniyan di nîva salên 1930 de, şoreşên Barzan 1943 – 1945, şoreşa Pêşewa Qazî Mihemed û damezrandina Komara Kurdistan de li Mehabad, şoreşa Îlonê, şoreşa Gulanê..



Damezrênerê mez-

intirîn û bihêztirîn partiya kurdî û Kurdistanî ye di dîroka nû ya Kurdistanê de, ku ew jî Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) ye.. Sala 1946 bergîriyêke pir aza li Komara Kurdistan dike û piştê di heman demê de di nava hersê perçeyên Kurdistanê Rojhilat û Başûr û Bakur de şerê hersê dewletên Îran û Iraq û Tirkîyê dike û di encamê de piştî ku ziyaneke mezin dighîne wan, karî xwe û hêza xwe derbas bike û bi rêyêke efsaneyî ava Aras qût bike û xwe bihîne Yekîtiya Sovyêt a berf.

Ji sala 1947 heta 1958 ji ber zordariya dagîrkeran derfet ji bo mana li Kurdistanê û xebata leşkerî nemabû, lewma jî Barzanî û 500 hevalên xwe li Yekîtiya Sovyêt jîyan û li wir xebateke siyasî û dîplomatîk girîng kirin..

Piştî ku Barzaniyê Nemir û hevalên xwe ji Sovyêt vegeyriyan Îraqê, Barzanî dest bi şoreşa Îlonê kir, ku bihêztirîn û dirêjtirîn şoreşa berfireh û niştimanî bû, ku 11.9.1961 ev şoreş li ser destê vî rêberî hat pêxistin û her Barzanî serkirdatiya wê dikir, ku nêzîkî 14 salan dirêj kir. Di 11ê Adara 1970 de rêjîma Îraqê neçar kir ku îtîrafê bi hebûn û beşek ji mafê gelê Kurd bike û di wan rojan de Hikûmeta Îraqê rêkeftina bi navê 11ê Adarê îmze kir, ku ew rêkeftin di dîroka hevçerx a Kurdistanê de yekemîn destkefta fermî û yasayî û netewî bû..

Di dirêjahiya jîyan û xebata Barzaniyê Nemir de, herçar dewletên dagîrker Îran û Iraq û Tirkîyê û Sûriyê, ligel çend welatên din ên navçeyê û cîhanê û herwiha destên reş ên navxwe, dijayetiya wî û şoreş û xebata wî dikirin û pîlan û êrişên leşkerî û siyasî û bi hemû awayekî şerê wî dikirin. Bi palewanî şerê hemûyan dikir û di rûyê wan de disekin û doza gelê xwe bilind hişt û qet qebûl nedikir ku dest ji ti mafêke rewa yê gelê xwe berde..

Dema di Adara 1974an de rêjîma wê demê ya Îraqê poşman bû ji Rêkeftinnameya 11ê Adarê û dest bi şer kir li dijî gelê me û li dijî Şoreşa Îlonê, di bin rêbertiya Barzaniyê

şikest û rêjîma Îraqê neçar bû ku berê xwe bide Îran û welatên ku li berjewendiya xwe digerin û hemû bûn destek li dijî şoreşa Kurdistanê û karî demkê wê şoreşê rawestînin..

Barzaniyê Nemir di dîroka dîr û nêzîk a gelê me de, yekemîn rêber û serkirde bû ku karî şoreş û xebat û bizava rizgarîxwaz a Kurd û Kurdistanê ji xebateke navçeyî bike bo xebateke seranserî û berfireh li Kurdistanê.. Herwiha di serdema xebat û rêbertiya Barzaniyê Nemir de pîrsa Kurd û mafên gelê me yê rewa gihîştin piraniya welatên dunyayê û deng û rengê şoreşa heqxwaz a Kurdan gihîşt hemû cîhanê.. Tekane rêber e ku zêdetirî nîv sedê bi bê westan di nava şoreş û têkoşînê de bû.. Tekane serkirde ye ku di rêya xwe ya xebatê de ewqas diwarî û zehmetî û kaş û kendal û girêk nedîtiye.. Nemir di salên xebata xwe rastî gelek pîlanên giran hatiye, di nava wan de jî 2 pîlanên navçeyî û navdewletî di salên 1947 û 1975 de bû ye, lê herdû jî derbas kiriye.. Di nava pêkhatiyên Kurdistanê de gelek alîgir û dilsozên Barzaniyê Nemir hene, ku bê cudahî ligel Barzanî û hizb û rêbaza wî bûne..

Heta niha diyartirîn serkirde û rêber e ku piştî wefata xwe jî, nav û xebat û têkoşîna şoreşa wî zindî maye.. Zêdetirîn serkirdeyê Kurdistanê ye ku xebat û şoreşên wî li ser asta cîhanê deng vedaye.. Li çendîn mozexaneyên navdewletî li welatan wêne û peykerên Barzanî hatine danîn û Barzanî di nava rêberên cîhanê de rêz kirine.. Niha jî partiya wî rêberê mezin li ser asta Başûrê Kurdistanê û Iraq û navçeyê û hemû cîhanê xwedî pêgeheke bihêz e û berdewam e li ser xebata bajar û li ser şoreşa dêmokrasî û medenî û birêvebirinê û pêşxistina civakê, her wek çawa Barzaniyê Nemir li ser çiya xebat dikir.. Her partiya Barzaniyê Nemir bû ku rêbertiya referandûma 25ê Îlonê kir, ku berdewamiya xebata ji bo mafê gelê Kurd bû ji bo serxwebûna Kurdistanê.

KDP.info

Şêx Abdûselam Barzanî û Dewleta Kurdistanê û Otonomî û Dewleta Federe ya Kurdistanê...



İbrahim GUÇLU

Şêx Abdûselam Barzanî, li Kurdistanê serokekî neteweyî yê dîrokî û bi navûdeng û gelek girîng e. Ew şaxsiyê û serokekî gelek balkêş û rewşenbîr û mut-effekîr e. Ew di heman dem de serokekî aristokrat yê oldar û serokê Nakşibendîyan bû.

Serokatîya Şêx Abdûselam Barzanî, ji serokatîya edetî cûdatir bûye. Xwediyê qarek-tereke milî, civakî, olî û reformxwaz bûye. Loma jî Şêx Abdûselam li herêma xwe gelek reformên dîrokî û girîng pêk tîne. Reformên di dema wî de pêk hatine, her Kurdek jî baş dizane û jê re rêz digrin, ev in:

1-Xwediyê mulkûnê ji holê radike.

2- Axê li gûndîyan belav dike.

3-Qelindê bûkê ji holê radike. Bi zorê zewacê qedexê dike.

4- Pêwendîyên civakî û herêmî û insanî, gor pîvanên wekhevî û edaletê rêdixe.

5-Biryar dide ku li her gundekî mescîdek ava bibe. Ew mescîdan bes wezîfeya ol û îbadetê nebînin.. Di hamen dem de bibin navendên civakî, navendên danûstandinê, navendên çareserkirina pirs-girêkan,

6-Li her gundekî ji bona ku pirs-girêk ji her aliyê ve çareser bibin, bi îradeya gûndîyan meclîsek/konseyyek ava dike.

7-Ji her eşîretêkê ji bona hêzên çekdar ava bibe, biryar dide û gor wê biryarê hewil dide.

Şêx Abdûselam bi van reformên xwe, bi hemû eşîretên Kurdistanê re dibe xwediyê peywendîyek xurt. Hemû eşîret jî bawerîya xwe ji Şêx Abdûselam Barzanî re nişan didin.

Ew di heman dem de xwediyê projeyekê civakî û milî ye jî. Ew dixwaze ku pêşî li herêma xwe û pişt re jî li tevayî Kurdistanê vê sîstemê ava bike. Ev sîstema jî, ji sîstema Împaratoriya Osmanî cûda û serbixwe ye. Ne sîstemek despotîk û otorîter e. Ew projeya wî, domandina projeya Şêx Abdûselam Barzanî ya milî ye.

Bi van projeyên wî, li Kurdistanê fikrên reformxwazî û civakî û milî belav bûn, rê û rêbazek nû ava dibû.

Şêx Abdûselam Barzanî, di sala 1907-an de bi hemû şêx û

serok eşîrên Kurdistanê re civînekê li dar dixê. Di wê civîne de biryarên gelek girîng tên girtin. Ew biryaran pêşkêşî desthilatdarîya Împaratoriya Osmanî dibin.

Ew biryarên dîrokî û girîng ev in:

1- Li Kurdistanê, divê zimanê kurdî bibe zimanê fermî.

2-Li Kurdistanê, perwerdayî divê bi zimanê kurdî bibe.

3-Qeymeqam, midurên navçeyan, xebatkarên din, divê ji Kurdan bînar kirin. An jî kêmîrîn divê ew memûrên ku kurdî dizanin ji bona Kurdistanê bînar kirin.

4- Divê di dadgehan de biryar gorî hiqûqa îslamê bînar dayin.

5-Divê bac bê girtin. Lê ev bac divê li Kurdistanê ji bona çekirina rêyan, avakirina dibistanan bê bi kar anîn.

Şêx Abdûselam Barzanî, ji bona ku ev projeyên xwe yê milî pêk bîne, bi Hemû Cemiyetên Kurdistanê re pêwendî datîne. Di heman dem de, bi Şêx Mehmûd Hafîd, Şêx Abdûlkadîr Nehrî, Axayê Şîkakan Simko û pêşengên civaka kurd yê din re jî danûstandin dike.

Dema ku ew daxwazên serok eşîr û şêxên Kurdistanê, digihîjin destê desthilatdariya Osmanî, ew daxwazan li dijî dewleta Osmanî wek îsyân tên qebûl kirin. Împaratoriya Osmanî, leşkerên xwe dişîne ser Kurdistanê. Hezar mixabin ji derveyî Eşîreta Barzan, eşîretên din li berxwe nadin. Mixabin beşek ji wan eşîran jî dibin hevalên dewletê. Wê demê Şêx Abdûselam biryara şer dide. Eşîreta Barzan, bi mehan şer dike. Lê Şêx Abdûselam Barzanî mecbûr dibe ku herêmê terk bike.

Şêx Abdûselam diçe herêma Suryaniyan. Suryanî, li Şêx Abdûselam xwedî derdikevin û cî didin wî.

Lê hêzên dewletê dikevin Kurdistanê û herêma Barzan, gûndan dişewitînin, malên gel talan dikin. Mêran dikûjin. Jin û zarokan dîl digrin. Wê demê Mele Mistefa Barzanî (Birayê Şêx Abdûselam yê biçûk) 3 salî ye. Ew, bi dêya xwe ve dîl tên girtin û di zîndana Misulê de tên girtin.

Beşek çekdar jî vedikişîn çiyayên bilind. Li benda biryara Şêx Abdûselam Barzanî dimînin.

Şêx Abdûselam, di sala 1908-an de vedigere Herêma Barzan. Hêzên xwe yê çekdar dîsa dicivîne ser hev, li hemberî hêzên dewleta Osmanî dest bi şer dike. Di vî şerî de, hêzên Dewleta Osmanî zerafên mezin dibînin û şikest dixwin.

Şêx Abdûselam Barzanî, li dijî Meşrûtiyeta Yekemîn (1908) jî derdikeve. Ew li dijî Ittîhad

Terakkiyan jî xwediyê helwest-eke reformxwaz e. Wan nijad-perest qebûl dike.

Piştî vê serkeftina Şêx Abdûselam Barzanî, Hikûmeta Osmanî, ji Şêx Abdûselam hevdtîne daxwaz dike. Ew jî qebûl dike. Piştî muzekereyan, dewleta Osmanî daxwazên wî qebûl dike. Herdu teref girtiyan azad dikin. Dewleta Osmanî, zerara daye herêmê tanzîm dike.

Lê dewleta Osmanî, bi soza xwe re girêdayî namîne, dest bi tade û zilmeke nedîtî dike. Di sala 1913-an de biryar dide ku Şêx Abdûselam Barzanî bê girtin. Loma jî hêzek çekdar dişîne ser wî.

Şêx Abdûselam jî wê demê mecbûr dibe ku biçe Rojhelata



Kurdistanê. Dibe mêvanê Seyîd Taha. Nêzikî Ūrmiyeyê li Rajanê bi cîh dibe. Di salên 1983-an de jî Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî li vî bajarî xwediyê bîngehekê bû.

Dewleta Osmaniyan, ji bona ku Şêx Abdûselam Barzanî dîl bê girtin û an jî bê kuştin, xelatek mezin pêşkêş dike.

Şêx Abdûselam Barzanî, di vê qonaxê de, bi Axayê Şîkakan Simko re hevdtîne dike. Bi hev re derbasî Gurcistanê, bajarê Tiflîsê dibin. Bi berpirsîyarên Çar re danûstandin dikin. Lewra Çar soz dabûye ku di têkoşîna milî ya Kurdan de bibe alîkar.

Piştî hevdtîna bi berpirsîyarê Rusyayê re, Şêx Abdûselam vedigere Îranê. Li Îranê, ew û Axayê Şîkakan Simko ji hevûdu vediqetin. Ew, encama dawetê diçe gundekî kurdan dibe mêvan. Xwediyê gûnd Sofî Abdûllah, dema ku Şêx Abdûselam û 3 hevalên wî di xew de bûne, wan digre teslîmî Dewleta Osmanî dike. Wek tê zanîn ji bona wî Dewleta Osmanî xelatek mezin danî bû. Encama vê îxanetê Sofî Abdûllah, ew xelata mezin werdigre.

Şêx Abdûselam Barzanî piştî dîl dikeve, wî dibin Misulê. Li Misulê, ji aliyê Sileyman Nazîfê Diyarbekirî -ku ew hevalbendê Ittîhad Terakkiyê bû-ve hat darizandin. Ew darizandina, darizandinek hiqûqî nebû, darizandinek gelek keyfî bû. Piştî darizandina nehiqûqî û keyfî, biryara îdamkirina Şêxê mezin û Serokê Kurdistanê hat dayin. Gorî nerînekê Şêx

Abdûselam Barzanî, di 14.12. 1914-an de, gorî nerînekê jî di destpêka sala 1915-an de tê îdam kirin.

Şêx Abdûselam Barzanî, li ber çavên malbata wî û birayên wî tê îdam kirin. Wê demê Mele Mistefa Barzanî biryar dide ku tu wext teslîmî dijminên mîletê kurd nebe.

Bi îdama Şêx Abdûselam, mîletê kurd serokekî xwe yê mezin wenda dike.

Şêhîdketina Şêx Abdûselam Barzanî, dibe sedem ku di Şerê Cîhanî Yekemîn de neteweya kurd, wek neteweyên din derfet bi kar bînin û dewleta Kurdistanê ava bikin.

Ittîhad Terakkiyên Osmanî, ji bona pêşîya pêvajoya dewle-

Barzanî ya neteweyî şopandin û meşandin. Ji bona ku neteweya kurd, mafê xwe yê neteweyî qezenç bike û li Kurdistanê statuyek serbixwe ava bibe û Kurd li welatê xwe desthilatdar bin, xebat û têkoşîneke bê hempa birêvebirin.

Dema ku Kurdistan bi Peymana Lozanê hat beş kirin. Wê demê Mele Mistefa Barzanî, li Beşû Başûrê Kurdistanê, ji Tevergera Neteweyî ya Kurdistanê re wê demê serokatî kir. Ji her tevger û serhildana neteweyî ya Başûrê Kurdistanê re piştgirî kir. Ji tevgerên neteweyî yê li Bakûrê Kurdistanê û Rojhelata Kurdistanê re bû piştgir. Dema di sala 1919an de, serhildana neteweyî dest pê kir, di sala 1925an de serhildanan dom kir, Mele Mistefa Barzanî û malbata Barzaniyan, ji van tevgerên neteweyî re bûn alîkar.

Dewleta Mehabad ya Kurdistanê, piştî Şerê Cîhanî yê Duyemîn, li ser mîrata Şêx Abdûselam Barzanî ya statuparêz û reformxwaz şîn bû. Dewleta Kurdistanê, bû dewleteke reformxwaz û makezagoneke gelek demokrat pejirand. Mele Mistefa Barzanî bi pêşmergeyên xwe ve bûn alîkarê damezrandina Dewleta Mehabadê ya Kurdistanê û ket bin xizmeta Dewleta Kurdistanê. Ji Serokatîya Qazî Mihemed re rêz girt. Bi xwe jî bû serleşkerê mezin yê Dewleta Mehabad ya Kurdistanê.

Dema ku Dewleta Îranê, ji bona ku Dewleta Kurdistanê ji holê rake, êrîş kir, bi daxwaza Qazî Mihemed, Mele Mistefa Barzanî, bi hevalên xwe ve derbasî Yekîtiya Sovyetan bûn.

Piştî ku Mele Mistefa Barzanî û hevalên xwe, di sala 1958an de vegerîyan Iraqê û Kurdistanê, Şoreşa Neteweyî ya îlonê jî girêdayî şûra neteweyî û civakî ya Şêx Abdûselam Barzanî dest pêkir û di sala 1970yî de bi avakirina Otonomiya Kurdistanê encam da. Di sala 1974an de, li hemberî Dewleta Iraqê ya faşîst û kolonyalîst, şerê ji bona Kerkukê jî bi şûra Şêx Abdûselam Barzanî dest kir û domand.

Şoreşa Neteweyî ya Gulanê jî di sala 1976an de, di bin serokatîya Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî de, bi şûra neteweyî û bi projeya Şêx Abdûselam Barzanî dest pê kir. Di gelek zehmetîyan re derbas bû. Di encamê de, ji bona avakirina Dewleta Federal ya Iraqê û Dewleta Federe ya Kurdistanê derfet çêkir.

Dewleta Federe ya Kurdistanê jî encama şûr û projeya Şêx Abdûselam Barzanî ye.

Divê hemû kurd li hemû beşan xwediyê vê şûrê bin û bi vê şûrê tev bigerin.

Jîyan û bi serhata azadîkarê gelê kurd Gêneral Mistefa Barzanî

Îro 16-ê tebaxê helkefta 77- salvegera damezrandina Partiya Demokrata Kurdistanêye. Pîrozbê!

Piştî Silemaniyê, gunde Barzan dibe navenda xebata sîyasî li başurê Kurdistanê:

Piştî şikesta şorişa Şex Mahmudê nemir barê xebat û karê Kurdayetiyê li başurê Kurdistanê bi yekcarî dikeve herema Behdînan ku navenda rêberatiya ve xebat û hereketa gundê biçuke Barzan e.



Qeza Mêrqaşor ku nahîyên Mêrqaşor, Barzan û Şervan digire ber xwe, girêdayî wilayeta Hewlêrê ye.

Devera Berzan beriya kû piştî çend şerhildanên kurdan bi yekcarî ji aliyê rêjîmên dagirker ve wêran bibe, 400 gundên awedan têda hebune û hejmara runiştvanan heremê zêdetir ji 40 hezar kesan buye. Herema Barzan û navenda wê gundê Barzan di çaxê Şêx Ebdulsalamê yekem da ku di sala 1872-ê zayînî de wefat kir, ji ber ku tekeya terîqeta Neqşebendî li Nehrîyê têda bu, mîna navendeke olî û awedan ku herdem tevî mirîdên ve terîqetê bu, tihat hesabandin. Şêx Ebdulsalamê yekemîn berêvajî şêx û axayên hemdemî xwe, mirovekî dadmend û bi edalet bu. Wek jêderên biyanî didin xuyakirin di çaxê wî da hinek karên baş û xebatên sosyalî ji bo pêşketina jîyan û rewşa civakî hatin kirin ku ger bi pîvanên roja îro bîn nirxandin û şirovekirin, di wê serdemêde pir girîng bun. Ji wan karan:



parvekirine zevî û erdê çandinê bi ser gundiyan de, qedexekirina milkdariya zêde bi şeweyên fêodalî, qedexekirina bi zorê zûdayîna keçan û parastina siruşt Kurdistanê anku birina dar û dirextan, şewitandina daristanan û qedexekirina kuştin teyr û tiwalan, neçira heyvanên kovî, bêhinfreyî li hemberî dîyanetên der û dora coxrafiya jîyana wan û herema Behdînan (Jîyana hevpar bi Kurdên êzidî, turkmên, kildanî, yehudî, xaçparêzên

ermeni ê musliman bun û ...) jîyana dostanî bi hemu gelên heremê re û xala herî girîng parastina mafê gelê kurd û serkeşiya bizava netewîya kurdan di here-mek coxrafiya girînga Kurdistanê de ku nişana dêmokratîkbuna bîr û ramanên bireveberên Barzanî bû, tesîrek mezin li ser bizava sîyasî loliya ve malbatê danî.

Piştî wefata Şêx Ebdulsalamê yekem kurê wî Şêx Mihemed Barzanî dibe cîgirê wî. Şêx Mihemed piştî zewacê dibe xwediye pênc kuran: Şêx Ebdulsalam, Şêx Ehmed, Mistefa Barzanî, Mihemed Sîdik û Şêx Babo. Wan tevan ji desbêka xwenasandinê bu hemu awayan xebat kirin ku rîya kalkê xwe ya xizmeta ji bo gel di hemu warên sîyasî, olî û civakî de dibomînin.

Navdartirîn endamê ve malbatê ku tevaya temenê xwe di rîya xebata sîyasîya jib o kurd û Kurdistanê derbas kir, Mistefa Barzanî ye.

Mistefa Barzanî kîye, çikiriye û serhildana wî di dîroka Kurdistanê de xwedî rolekî çawaye?

I Şah Təhmasib Əmir Şərəfi Qəzvinə çağırıb onu sarayda saxlamaq istəyirdi. Lakin saray daxilindəki çəkişmələri görə Əmir Şərəf ölkənin digər bir tərəfinə göndərilməsini şahdan xahiş edir. Şah onu Şirvan mahalının bezi yerlərini idarə etməyə məmur təyin edir və Şirvana tabe olan Ağdaş, Qəbələ, Bakı və Sahil nahiyələrinin xüsusi gəlirindən Ruzəki qəbiləsi üçün maaş ayırır. Əmir Şərəf 8 ay Şirvan hakimi olduqdan sonra (1576) I Şah Təhmasib vəfat edir. Bidlisi yazır ki: «Bununla əlaqədar sarayda hərəmçilik başlanır. Heydər Mirzə öldürülür (76, 453), İsmayıl Mirzə Qəhqəhə həbsxanasından çıxıb Qəzvinə gəlir. O, II Şah İsmayıl adı ilə şahlıq taxtında oturur (1576-1578).

Yeni Şah Osmanlı-İran hökumətləri arasında düşmənçilik və dağıdıcı müharibələr üçün bəhanə olan sünni-şie ziddiyyətlərini bir qədər yumşaltmaq məqsədilə saraydan uzaqlaşdırılmış sünniləri yenidən saraya cəlb edərək, onlardan özü üçün xüsusi məşvərətçilər təyin edir (125, 26). Bununla əlaqədar Əmir Şərəf də II Şah İsmayılın əmri ilə Şirvandan saraya dəvət edilir. Müəllif göstərir ki: «Həmişə şahın yanında olmaq şərti ilə mənə bütün kürd qəbilələrinin böyük əmiri təyin etdilər. Beləliklə də Kürdüstan, Loristan, Goran və başqa kürd əmirləri şaha olan müraciətlərini yalnız mənə etməli idilər» (76, 453; 97, 378). Bu zaman müəllifin atası Şəmsəddin Bidlisi də, İsfahandan Qəzvinə dəvət edilir. Lakin o, qoca olduğu üçün qulluq qəbul etmədi və 1576-cı ildə 70 yaşında vəfat etdi. Onun Əmir Şərəfdən başqa, Xələf adlı bir oğlu da var idi.

Beləliklə, II Şah İsmayılın Əmir Şərəfə olan müsbət münasibəti və sünni cərəyanına nisbətən ən yumşaq siyasəti, o zaman Səfəvilər sarayında böyük nüfuzlu malik olan Qızılbaş sərkərdələri arasında ciddi narazılığa səbəb oldu. Onlar II Şah İsmayıla bildirdilər ki: «Əmir Şərəf qardaşın oğlu Sultan Mirzənin xeyrinə olaraq səni aradan aparmaq fikrindədir» (76, 454; 121, 464). Digər tərəfdən isə onlar sünnilər ilə yaxşı rəftar etdiyi üçün şahı hədələməyə başladılar. Onlar şahın yatağına hədələyici məktub atdıqdan sonra, şah bir neçə nəfəri sünnilik ittihamı ilə saraydan uzaqlaşdırdı (125, 27). II Şah İsmayıl 20 il həbsdə qaldığı üçün həddindən artıq bədbin, zəif iradəli və heç kəsə etimad etməyən bir hökmdar idi. Bidlisi yazır ki: «Buna görə də saray müxalifətçilərinin planları baş tutdu, şah əmirlərin bəzilərini cəzalandırdı, bəzilərini isə işdən kənar etdi» (76, 453–454). O, Əmir Şərəf Bidlisini də saraydan uzaqlaşdırmaq məqsədilə (1577-ci ildə) onu Naxçıvan vilayətini idarə etməyə göndərdi. Bu hadisə ilə əlaqədar olaraq Bidlisi yazır: «Bu sürgün və uzaqlaşma xoşbəxt taleyimin başlanması və vətənə getməyimin müjdəsi oldu» (76, 454; 97, 479).

Bu dövrdə Səfəvilər sarayında hərəmçilik artmış, II Şah İsmayıl öldürülmüş və Sultan Məhəmməd Xudabəndə (1578-1587) hakimiyyətə keçmişdi. Onun zamanında Qızılbaş sərkərdələrindən ibarət olan yeni feodallar arasındakı mübarizənin qüvvətlənməsi mərkəzi hakimiyyətin zəifləməsinə səbəb olurdu. Bu vəziyyətdən istifadə edən III Sultan Murad Azərbaycanı işğal etmək məqsədilə Osman paşanın başçılığı ilə Dərbəndə qoşun göndərdi.

Oruc bəy Bəyatın yazdığına görə bu zaman Naxçıvan hakimi Şərəf xan Bidlisi də öz silahlı qüvvəsi ilə Osmanlı ordusuna qarşı çıxmışdı (46, 187). «Şərəfnamə»dəki məlumata görə həmin ildə (1578) Bidlisi Azərbaycanı tərk etmişdi (76, 454). Çünki III Sultan Muradın göstərişi ilə Van hakimi Xosrov paşa çoxdan Şərəf xan Bidlisini Azərbaycandan aparmaq və Azərbaycan üzərinə olan yürüşdə ondan istifadə etmək fikrində idi. O, bu işin icrasını kürd əmirlərindən Hekari hökmdarı Zeynal bəy və Həsən bəy Mahmudiyəyə tapşırırdı. Bidlis yazır: «3 şəvval 986 (3 dekabr 1578)-ci ildə 400 nəfər, o cümlədən 200 nəfərlik Ruzəki qəbiləsi ilə Naxçıvandan Bidlisə tərəf hərəkət etdik» (76, 454). 3 gündən sonra Əmir Şərəf və onun tabeliyində olanlar Van şəhərinə çatdılar. Onlar Xosrov paşa tərəfindən təntənə ilə qarşılandılar. III Sultan Muradın Mustafa çavuş vasitəsilə göndərdiyi hökmdarlıq əmri və hədiyyə olunan qızıl qılafı qılınc Xosrov paşa vasitəsilə Əmir Şərəfə təqdim olundu. Sultanın nazirləri, o cümlədən nazir Məhəmməd paşa məktub vasitəsilə Əmir Şərəfə öz hörmətini bildirdi. Sərdar Mustafa paşa da onun üçün xələt və qızıla tutulmuş qılınc göndərmişdi.

Bu faktlardan aydın olur ki, Osmanlı dövləti Əmir Şərəfi Azərbaycandan aparmaq üçün çoxlu pul xərc etmiş və xeyli hazırlıq işi görmüşdü. Əmir Şərəf isə Səfəvi dövlətinin

zəifləmək prosesini hiss etdiyi üçün Osmanlı hakimiyyətini qəbul etmişdi. Beləliklə, iki dövlət arasında cərəyan edən ziddiyyətlərin ardınca gedən digər kürd əmirləri kimi, Əmir Şərəf də 1542-1578-ci illərdə Azərbaycanda təlim-tərbiyə və təhsil aldığı, uzun zaman Səfəvilərə xidmət etdiyi halda, Azərbaycanı tərk etmişdi. O, 37 yaşında ikən Kürdüstan gəlmiş və öz irsi mülkü Bidlis vilayətinin əmiri olmuşdur. Bidlisi özü üçün xoşbəxtlik hesab etdiyi bu hadisəni şerlə belə təsvir edir:

شکر خدا را که هر چه طلب کردم از خدا
بر منتهای همت خود کامران شدم

(Tərcüməsi: Allaha şükr Allahdan hər nə istədim – öz səyimin nəticəsində ona nail oldum) (76, 455; 121, 465).

Əmir Şərəf Kürdüstan gəldikdən sonra III Sultan Muradın Gürcüstan, Şirvan və Azərbaycanın başqa mahallarına qarşı 10 il (1578-1587-ci illər) davam edən hərbi yürüşlərində iştirak edərək sultana olan sədaqətini əməldə göstərir (76, 456). Buna görə də Sultan Murad öz xətti ilə Əmir Şərəfə yazdığı məktubları «Sədaqətli dostum Şərəf xan» (97, 380; 121, 465) sözü ilə başlayaraq ondan razı qaldığını bildirirdi. III Sultan Murad tərəfindən yazılan həmin məktublardan birində deyilir: «Şərəf xan! Sizin sədaqət və fədakarlığınız dərğahı aliyyə məlum və bizim Bargaha qəbul olmuşsunuz, ətəyə şahənədən bənəsib deyilsiniz, bu müzəffər səfərdəki rəhbərliyinizdə göstərəcəyiniz səylər, yenidən sizin dərəcə və şərəfinizi artıracaqdır. Ona görə də lazımdır ki, öz hökumətin və hövzəyi əyalətində olan dilavərlərlə birlikdə, bizim qoşunla birləşərək böyük sərkərdələrimdən olasınız. Çünki əcdadının apardığı yaxşı vuruşmalardan xəbərim vardır.

Əminəm ki, siz də ali məqam sipəhdarımın rəyi ilə gözəl məsləhətlər verməkdən imtina etməyəcəksiniz» (28, 227-228).


Bu məktubdan bir daha aydın olur ki, Azərbaycana yaxşı bələd olub və sərkərdəlik bacarığına malik olan Şərəf xan sultan ordusunda əhəmiyyətli rol oynamışdır. Osmanlıların Azərbaycana olan bu hərbi səfəri nəticəsində Təbriz şəhəri 1585-ci ildən 1602-ci ilə qədər, yəni 17 il osmanlıların əlində qalmışdı 1583-cü ildə isə sərdar Fərhad paşa İrəvanı işğal edib, orada qala tikdirdiyi zaman Şərəf xan Bidlisi, Şamın böyük əmiri Həsən paşa ilə birlikdə Tiflis və ümumiyyətlə Gürcüstanın xəzinəsini və ərzaq mallarını götürmək üçün III Sultan Murad tərəfindən məmur olunmuşdu. Onun bu səfərdə göstərdiyi yaxşı xidmətinə nəzərə alan III Sultan Murad hər il 200 min osmanlı ağçası məbləğində vergi gətirən Muş (hazırda Türkiyə tərkibinə daxildir) əmirliyini də Bidlis vilayətinə əlavə etdirdi. Beləliklə, Əmir Şərəfin illik maaşı 410 min ağçaya bərabər oldu. Müəllif qeyd edir ki: «Hələ o vaxta qədər Ali Osman sülaləsi heç bir vilayətin əmirinə belə bir mərhəmət göstərməmişdi» (76, 456; 121, 465). Bidlisi öz tərcümeyi-halını bu cümlə ilə başa vurur: «İndi hicri 1005-ci il zilqədə (iyun 1597-ci il ayının axındır. III Sultan Məhəmməd xanın (1597-1603) sayəsində irsi mülkümün hökmdarlığı özümdədir. Lakin bu yüksək vəzifədən böyük oğlum Şəmsəddin bəyin xeyrinə olaraq əl çəkmişəm» (76, 457; 97, 381).

Müəllif özü qeyd etmir, lakin İskəndər Münşi öz əsərində onun Ziyaəddin adlı oğlunun hicri 1025-ci ildə Bidlis əmiri olduğu haqqında məlumat verir (47, 721; 69, 206). Bidlisi Əbdürrəhman Caminin şeirindən istifadə edərək, oğluna xitabən yazır:

بیا ای جگر گوشه فرزند من
بنه گوش بر گوهر بند من
صدف وار بنشین دمی لب خموش
چو گوهر فشائیم بمن دار گوش
شنو پند و دانش بان یادکن
چو دانستن آنگه بدان کار کن

(76, 456; 121, 467)

(Tərcüməsi: Gəl ey ürəyimin parçası oğlum, qulaq ver mənə gövhər kimi sözümə, sədəf kimi bir anlığa sus otur, qiymətli sözlərimə qulaq as, oğlum. Elm öyrənib,



nəsihəti də eşit – elə ki, bildin ona əməl et oğlum).

Bidlisi bu şeirlə oğlunu elm adamı, dövlət xadimi və ləyaqətli bir varis olmağa sövq etmişdir.

Şərəf xan Bidlisinin təbiyə və təhsil dövrünü istisna etdikdə onun həyat və fəaliyyətini iki dövrə bölmək olar:

I dövr 1554-1586-cı illəri əhatə edir. Bu dövrdə Bidlisi öz zamanəsinə görə bacarıqlı sərkərdə və müdrik dövlət xadimi kimi Səfəvi şahlarına və Osmanlı sultanlarına xidmət etmişdir.

Oruc bəy Bayat onu Azərbaycanın görkəmli sərkərdələri sırasında qeyd edir (46, 187).

II dövr isə 1586-cı ildən başlayaraq, ömrünün sonuna qədərki müddəti əhatə edir. Bu dövr Bidlisi həyatının əsas yaradıcılıq dövrüdür. Müəllif öz həyatında böyük əhəmiyyət kəsb edən bu dövrdə «Şərəfnamə» əsəri üzərində işləyərək, öz istedadını, dinə baxışını və Ali Osman xanədanı ilə Səfəvilər sülaləsinə olan münasibətini də qələmə almışdır. Friç qeyd edir ki: «Şərəf xan öz zamanəsinə görə mükəmməl bir təhsil və təbiyə görmüş dindar, aqil və müdrik bir zat idi» (97, 360).

Müəllifin hansı tarixdə vəfat etdiyi heç bir mənbə və ədəbiyyatda qeyd edilmir. Lakin onun tərcümeyi halında yaşının 60-a yaxın olduğunu görmək olur (76, 449-456).

Velyaminov-Zernov isə «Şərəfnamə»də qeyd olunan kürd Mahmudi qəbiləsinə aid V fəslin (1598-ci ildə) yazıldığını və müəllif tərəfindən yoxlanıldığını qeyd edir (76, 17). Beləliklə, Şərəf xan Bidlisinin 60 ilə qədər (1543-1598) yaşadığını güman etmək olar.

Bidlisinin yaradıcılığa başladığı tarix də sonrakı müəlliflər tərəfindən müxtəlif surətdə qeyd edilmişdir. Məsələn, Velyaminov-Zernov M.Volkovun yazdığına istinad edərək, onun Bidlis vilayətinə qayıtdıqdan sonra (1578) dərhal öz əsəri üzərində işlədiyini qeyd edir (76, 10).

N. Fəlsəfi Bidlisinin 1581-ci ildən yaradıcılıqla məşğul olduğunu göstərir (125, 204).

Müasir kürd tarixçisi Şakir Xəsbak öz əsərində Şərəf xan Bidlisinin 1586-cı ildən yaradıcılığa başladığını iddia edir (80, 15). Şərəfxan özü isə göstərir ki: «O, Bidlis əmirliyinə mənsub olduqdan sonra 10 ildə III Sultan Murad xanın apardığı müharibələrdə iştirak etmiş və öz sədaqətini Sultana bildirmişdir» (76, 456).

Beləliklə, müəllifin öz qeydinə istinadən demək olar ki, Bidlisi öz əsərinin birinci cildi üzərində 1586-cı ildən, yeni Şakir Xəsbakın qeyd etdiyi tarixdən işləməyə başlamışdır. İkinci cildin yazılması isə III Sultan Məhəmməd zamanına aid edilir. Çünki müəllif həmin cildin başlanğıcında saray müəlliflərinə xas olan ifadə tərzini qeyd edir ki: «Mən uzun müddət bu ali qədr ailənin xadimləri sırasında olub, xüsusilə şahlar şahı, ədalətpərvər və qaliblər atası III Sultan Məhəmməd xana yaxın olduğum üçün onların, həm də onlarla müasir olan İran və Turan şahlarının şahlığa çatdıqdan indiyədək tərcümeyi-halları haqqında əsər yazmaq fikrinə düşmüşdüm» (78, 3-4).

(Ardı gələn sayımızda)

Serok Barzanî: Rêya Barzanî û PDKyê bûye hêviya Kurdistanê



Serok Mesûd Barzanî got ku "Rêya Barzanî û PDKyê tim û tim bûye hêvî û aliyê bihêz yê Kurdistanê."

Îro 77emîn salvegera damezrandina PDKyê û herwiha rojbûna Serok Mesûd Barzanî ye. Serok Barzanî bi sedema

damezrandina Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) peyamek belav kir.

Serok Barzanî di peyama xwe de, "malbatên serbilind ên şehîdan, Pêşmergeyên qehreman, serkirdayetî, kadro, endam û alîgirên PDKyê" herwiha tevê gelê

Kurdistanê, hemû xebatkar û azadîxwaz pîroz kirin.

"Wan doza gelê Kurdistanê bihêztir kiriye"

Serok Barzanî amaje pê kir ku alîgir û endamên PDKyê di rêya Kurdistanê de gelek qurbanî dane û ew tim bûne haveynê berxwedan û bihêztirkirina doza gelê Kurdistanê.

"Şehîdên rêya azadiyê namirin"

Serok Barzanî anî zimên ku rê û rêbazên Barzanî û PDKyê bûne hêviya Kurdistanê û got:

"Rêya Barzanî û PDKyê tim û tim bûye hêvî û aliyê bihêz yê Kurdistanê, herwiha bûye parêzvana doza rewa ya gelê Kurdistanê.

Divê rêveberî, girse û endamên PDKyê vê berpirsariya mezin bi cih bînin.

Şehîdên rêya azadiyê namirin." **Rûdaw**

Nêçîrvan Barzanî: Şanazî ye ku PDK heta niha jî bi germî di meydana xebatê de ye û nûnertiya gelê Kurdistanê dike

Nêçîrvan Barzanî di salvegera damezrandina PDKê de ragihand ku şanazî ye ku PDK piştî temenekî dirêj, heta niha jî bi germî di mey-



dana xebatê de ye û nûnertiya gelê Kurdistanê dike. Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî, bi boneya damezrandina Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) peyamek belav kir.

Nêçîrvan Barzanî wiha got:

"Bi rêz û rûmet salvegera bûyer û werçerxaneke mezin a çarenivîsaz di dîroka gelê Kurdistanê de dikin.

Bi germî pîrozbahiye li Serok Barzanî, malbat û kesûkarên şehîdan, polîtîburo û komîteya navendî û hemû organ, kadro û endamên PDKyê dikim.

Şanazî ye ku PDK piştî temenekî dirêj, heta niha bi germî û gurî di meydana xebatê de ye û nûnertiya gelê Kurdistanê dike.

Ji bo rûbirûbûn û çareserkirina astengî û bîdestxistina siberojêke baştir û bi hêvî, rêbertiya xelkê Kurdistanê û armancên wê yên bilind dike.

Îro wekî dîrok û dana qurbanîyan, erk û berpirsariyên PDKyê dîrokî û mezin in.

Divê wekî her demê erk û berpirsariyên xwe bîne cih, hemû kesî li hev kom bike û ji bo çareserkirina pirsgirêkan înisyatîvê wergire. Divê parêzer û pêşengê tebayî, yekrêzî, bihevrebûn, hevqebûlkirin û alîkariyê be.

Divê rola xwe ya aktîv û bibandor di parastina azadî, demokrasî, maf û destkeftên destûrî yên gelê Kurdistanê û ferzkirina federaliyê de bibîne. Silav li hemû endamên partiyê, ji we û hemû gelê Kurdistanê re hêviya serkeftinê dikim." **KDP.info**

Li Silêmaniyê konferansa aborî û bazirganiyê di navbera Herêma Kurdistanê û Îranê de birêve diçe

Li Silêmaniyê bi amadebûna hejmarek ji berpirsên herdu alîyan, bazirgan û karsazan, konferansa aborî û bazirganiyê di navbera Herêma Kurdistanê û Îranê de birêve diçe. Ajansa Kurdistan24ê yê li Silêmaniyê ragihand, îro 19ê Tebaxa 2023an, konferansa aborî û bazirganiyê di navbera Herêma Kurdistanê û Îranê de dest pê kir û heta êvarê dê berdewam be.



Serokê Yekîtiya Hawirde û Hinardekarên Herêma Kurdistanê Mistefa Şêx Ebdurehman di axaftina xwe de bixêrhatinî li amadebûyên konferansê kir û got: "Em dixwazin pêwendiya aboriyê ya navbera Herêma Kurdistanê û Komara Îslamî ya Îranê bihêztir bikin, ku niha qebareya wê salane şeş milyar dolar e."

Mistefa Şêx Ebdurehman eşkere kir, wek Yekîtiya Hawirde û Hinardekarên Herêma Kurdistanê armanca wan ew e ku pêwendiyên xwe ligel Îranê roj li pet roj ber bi pêşve bibin û got: "Sînore me yê berfireh ligel Îranê heye û em dixwazin pêwendiyên bazirganiyê pêşve bibin." **K24**

Efrîn: Grûpên çekdar ji her malbatekê 50 dolar bac distînin

Tevî biryara Wezareta Xezîneyê ya Amerîkayê ya cezakirina grûpa Sultan Silêman Şah jî binpêkirinên grûpê yên li Efrînê berdewam in.

Li gorî çavkaniyekî taybet ku ji ajansa Rûdawê re axivî, çekdarên grûpa Sultan Silêman Şah ku wek Emşat tê naskirin, li navçeya Şiyê wek bac 50 dolarên Amerîkî ji welatîyên ku alîkariyan werdigirin distîne.

Grûpa çekdar herwiha hezar û 500 dolaran jî ji kesên di van demên dawî de vegeyriyane malên xwe distîne.

Heman çavkaniyê da zanîn ku fermanarên Emşatê lîsteya alîkariyên ku li welatîyan tîne belavkirin, bi dest xistiye û li gorî lîsteyê ji her malbatekê 50 dolaran distînin.

Herwiha kesên bacê nedin jî bi danûstandina bi Rêveberiya




Xweser re tîne tawanbarkirin û girtin.

Heman grûpa çekdar biryarek derxistiye ku her malbateke Efrînî yê ku di van demên dawî de vegeyriyane malên xwe, divê hezar û 500 dolaran bide.

Li navçeya Mabetayê jî ciwanê bi navê Hesên Qaziqlî Bekir ê ku ev nêzîkî mehekê ye hatibû girtin, piştî hat berdan, beriya çend rojan careke din hate revandin bi hezar dolarî careke din hat berdan. **Nerina Azad**

Fîlmek li ser şoreşa Jîna Emînî hat berhevanîn



Kurtefîlma "Deng Hilat" ezmûneke nû ya Firya Yûnis û Hawar Faris e û li ser şoreşa Jîna Emînî hatiye berhevanîn.

Firya Yûnis ku senaryoya fîlmê nivîsandiye û karê derhênanê kiriye, ji Kurdistan24ê re ragihand: "Ev fîlm çîroka du qurbanîyên şoreşa Jîna vedibêje, ku di dema şoreşê de dixwazin

sirûdekê ji bo şoreşgeran binivîsin, lê belê tîne desteserkirin û li zindanê êşkence dibînin û destdirêjî li wan tîne kirin, piştî demekê dikarin ji Îranê derkevin û sirûda xwe li welatekî din binivîsin." Herwiha diyar kir, di fîlmê de hunermend Nîkwan Qadirî, Dilniya Weysî, Emîr Siracedîn, Dilniya Lutfî û Hawar

Faris lîstine û bi sponsoriya rêxistina "Pêşrewên Baweriyê" hatiye berhevanîn. Firya Yûnis ragihand, Mihemed Salih Kerîm, Kurmanc Hoşyar û Horîn Yûnis alîkarên derhênerê fîlmê ne, ku muzîka wê Nîkwan Qadirî û Arya Ehmedî çêkirine û got: "Di demeke nêz de promoya fîlmê dê were belavkirin."

Jîna Emînî keça Kurd a 22 salî a ji bajarê Seqiza Rojhilatê Kurdistanê roja 13ê Îlona 2022an, ji ber ku hîcaba xwe bi awayekî rêkûpêk girê nedaye, li Tehranê ji aliyê polîsan ve hatibû binçavkirin û piştî du demjimêran bo nexweşxaneyê hat birin û roja 16ê mehê li nexweşxaneyê canê xwe ji dest da. Malbata Jîna û çalakvanên Rojhilatê Kurdistanê dibêjin, Jîna di bin êşkenceyê de hatiye kuştin. **K24**

Serok Barzanî ligel rêxistinên PDKê yên devera Badînanê civiya



Serok Mesûd Barzanî îro 19ê Tîrmeha 2023an li devera Badînan ya Duhokê ligel rêxistinên Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) civiya.

Di civînê de ku bi armanca pevguhertina nêrînan li ser kêşeyên welatîyan, haydarbûna ji rewşa rêxistinên partî û şopandina encamên 14. Kongreya Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) hatibû organîzekirin, Serok Barzanî gotarek pêşkêş kir.

Serok Barzanî di gotara xwe de ronahî xiste li ser rewşa PDKê, biryarên kongreya 14 ya PDKê, rewşa siyasî ya Herêma Kurdistanê û rûbirûbûna metirsî û astengiyan di qonaxa niha û paşerojê de. Serok Barzanî ji bilî amajepêdan bi wê yekê ku di babetê hilbijartinên PDKê de her ji piştî rapêrînê ve destpêşxerîya lidarxistina hilbijartinan kiriyê ji bo veguhastina rewatiya şoreşgerî bo rewatiya destûrî. Herwiha tekez kir ku

divê em ber bi hilbijartinan ve biçin û divê PDK jî bawerîya gel biparêze. Got jî: Her kesê ku bi xema berjewendiyên Kurdistanê be, ti carî astengî li pêş proseya hilbijartinan dernaxe.

Serok Barzanî ew yekî dubare kir ku divê aliyên siyasî tevî cudabûna bîr û baweriyên xwe, li ser xetên niştîmanî û parastina qewareya Herêma hevnerîn bin.

Serok Barzanî di dirêjahiya axaftina xwe de ronahî xiste ser peywendiyên di navbera Herêma Kurdistanê û Iraqa Federal de û behsa ji dîroka wan peywendiyên di bîst salên borî de kir. Tekez jî kir ku ji bo Iraq aram bibe, divê hemû alî rêz li destûr û pîrensîpên hevbeşî, hevsengî û lihevkerî bigirin.

Her di wê civînê de, Serok Barzanî daxwaz kir ku kar ji bo kûrtkirina hesta niştîmanperwerî di nava ciwanan de û hişyarkirina welatîyan li hember metirsiyan û piştgiyariya Hikûmeta Herêma Kurdistanê bê kirin.

Piştî axaftina Serok Barzanî, deriyê gotûbêj, pirs, rexne û têbînî ji bo beşdarên civînê hat vekirin û Serok Barzanî bersiv û ronîkirinên pêwîst pêşkêşî amadebûyan kir. **Nerina Azad**

Amerîkayê grûpên çekdar ceza kiribûn, Rêveberiya Xweser daxuyanî da

Hevserokê Desteya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser Bedran Çiya Kurd got "Biryara Wezareta Xezîneyê ya Amerîkayê ya dawî ya li

Bedran Çiya Kurd di daxuyaniyê de got "Em dibînin ku ev biryar gaveka erênî ye ber bi pêkanîna edaletê ve, lê ew tenê têrê nake ku mafên

dadgehkirina hemû tawankaran bang li civaka navdewletî kir ku komîsyoneke navdewletî ya lêkolînê bişîne û wiha anî ziman:

"Ev rewşa trajedî pêwîstiya wê bi şandina Komîteya Lêpîrsînê ya Navdewletî heye, ku bi awayekî lezgîn here deverên dagîrkirî, bi taybet Efrînê.

Ji ber wê edalet ew e ku hemû tawankar bo Dadgeha Cînaî ya Navdewletî bîn pêşkêşkirin, ji ber ku kiryarên wan tawanên şer û dijî mirovan in.

Hiştina wan bêyî hesabdîtinê de rewşê bêhtir tevlihev bike û dê nêrîmî li raya giştî ya Efrînê peyda bibe, ji ber ku wê berê xwe bidin tolhildanê.

Ji ber wê divê edalet bo qubaniyan were pêkanîna û sînorek ji tawankarên ku şûrê wan li ser stûyê sivîlan e, bê danîn."

"Pêkanîna ewlehiyê bi dawîkirina dagîrkeriyê pêk tê"

Çiya Kurd di daxuyaniyê de wiha berdewam kir:

"Pêkanîna edaletê ji bo sivîlan û peydakirina ewlehiyê û seqemgîriya wan deveran bêyî bidawîkirina dagîrkeriyê û derxistina wan komikên terorîst û karkirina li ser rewşa vegeandina koçberan a ewle pêk nayê.

Civaka Navdewletî perpirsyariya tiştê ku li deverên dagîrkirî rû didin, digire û ji wan tê xwestin ku qanûnên ku wan bo mafên mirovan çêkirine, biparêzin û pêk bînin." **Nerina Azad**



ser fezkirina cezayan derheqê hin serekên komikên nandoz ji ber ku tawanên şer pêk anîbûn û Kurd ji Efrînê koçber kiribûn, biyareka di cihê xwe de ye."

Wezareta Xezîneyê ya Amerîkayê doh ji ber zordarî û derbideriya ku wan anîye serê Kurdên herêma Efrînê, ceza bi ser grûpa Silêman Şah û Firqeya Hemzeyê de sepandibû.

Hevserokê Desteya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser a Rojavayê Kurdistanê Bedran Çiya Kurd li ser biryara Amerîkayê ya cezakirina grûpên çekdar daxuyaniyek belav kir.

"Gaveke erênî be jî têr nake"

Hevpeymaniya Navdewletî çek û pêdiviyên leşkerî pêşkêşî Firqeya 1 û 2 ya Pêşmerge kir

Wezareta Pêşmerge ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê eşkere kir ku ji aliyê hêzên hevpeyman ve çek û alavên leşkerî yên nû hatine dabînkirin û li ser firqeyên 1 û 2 yên Pêşmerge hatine belavkirin.

Wezareta Pêşmerge di daxuyaniyekê de ragihand, di berdewamiya alîkariyên lojîstîk ên hevpeymanan bo Hêzên Pêşmergeyên Kur-

distanê, îro 17.08.2023ê di merasîmeke taybet de li Rêveberiya Giştî ya Leşkerî bi amadebûna kolber Ferman Zrarî. Beşek ji alîkariyên hevpeymanan radestî hêzên 1 û 2 yên Wezareta Pêşmerge hatin kirin. Pîgirê serfermandariya Pêşmerge berdewamiya alîkariyên hêzên hevpeyman bo hêzên pêşmerge bilind nîrxand û amaje bi wê yekê jî

kir ku, hêzên hevpeyman ji destpêka damezrandina DAIŞê ve heta niha alîkariya hêzên Pêşmergeyên Kurdistanê kirine, ji ber wê jî ev alîkarî roleke girîng di têkşikandina DAIŞê û grûpên terorîstî de hebû û asta hevkarî û hemahengiya hevpeymanan bo hêzên Pêşmerge bê zêdekirin û derbasî qonaxêke baştir bibe. **Nerina Azad**

Serok Barzanî gihîştê Amêdiyê

Serok Mesûd Barzanî gihîştê qezaya Amêdiyê û ligel hemû çînen deverê dicive.

Serok Barzanî di çarçoveya serdana xwe



ya bo parêzgeha Duhokê de îro hate navçeya Amêdiyê û li gel kadr û endamên Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) û xelkê navçeyên cuda yên navçeyê civiya.

Berpîrsê Liqa 18 ya Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) yê li Amêdiyê Berevan Hemdî ji Kurdistanê re ragihand: "Hatina Serok Barzanî bo Amêdiyê wê yekê digihîne ku ev dever li cem Serok Barzanî girîngiya wê taybet heye, loma hemû xelkê Amêdiyê îro dixwazin beşdarî civîna Serok Barzanî bibin, bêguman hatin wî dibê mayeya guherîna ji aliyê seqamgîrî û encamdana projeyên zêdetir li vê deverê."

Berevan Hemdî diyar kir: "Serok Barzanî ligel hemû çînen Amêdiyê dicive û guh dide gilî û gazindên xelkê. **Nerina Azad**

Cîgirê Wezîrê Navxwe yê Îranê pesnê Herêma Kurdistanê dide

Cîgirê Wezîrê Navxwe yê Îranê bo Karûbarê Ewlekariyê Seyid Mihemed Mîr Ehmedî ligel Konsulê Giştî yê Îranê li Hewlêrê serdana deriyê sînorî yê Hacî Omeranî kirin. Cîgirê Wezîrê Navxwe yê Îranê diyar kir: "Rojane zêdetir 50 hezar hecî di vê deriyê sînor re derbas dibin."



Herwiha got: "Ez spasiya Serkîdîtiya Herêma Kurdistanê, birêz Mesûd Barzanî û Nêçîrvan Barzanî dikim. Heciyên Çileya Îmam Husên ev sal in di deriyê Hacî Omeran re ber bi Kerbelayê ve diçin. Keşûhewayê guncaw û amadekarî û asankariyên berpîrsên Herêma Kurdistanê yên li ser sînor kirine, bûne sedem ku em vî sînor zêdetir bi heciyên xwe bidin naskirin."

Got jî: "Li gorî lêkolînên me, rojane herî kêm 50 hezar kes dikarin sînor derbas bikin. Her kes heyama xuleyekê de sînor derbas dike, ji ber wê jî di 24 demjimêran de dikare 70 hezar hecî derbas bibin. Rewşa xanî, tendurîstî û xizmetên din li vir pir baş in û ez spasiya wan dikim."

Pêştir Peyamnêrê K24ê li Soranê ragihandibû, li gorî rêkeftina di navbera aliyên Îranî û Herêma Kurdistanê de, hatina heciyan di deriyê Hacî Omeran re û ji wir ji bo bajarên din ên Iraqê, duhî Înê dest pê kir."

Tê pêşbînîkirin ku nêzikî 500 hezar heciyên Îranî bi rêya deriyê sînorî yê Hacî Omeran re derbasî Herêma Kurdistanê bibin û ji wir jî ber bi Necef û Kerbelayê ve biçin. Di vê derbarê de, Berdevkê Deriyê Hacî Omeran Sîrwan Husên pêştir ji K24ê re gotibû, hemû amadekariyên pasaport, xalên kontrolê, dabînkirina cih û otobusan bo veguhestina heciyan temam bûne. Bi milyonan Şîe ji Iraq, Îran û welatên ji bo bîranîna Çileya Şehîdbûna Îmam Huseyn ber bi Kerbelayê ve diçin. Çileya Îmam Husên ji bo Şîeyan, yek ji merasîmên olî yên herî bi nav û deng e, ew bi serdana gora Husên ibn Elî ibn Ebî Talib, ku îmamê sêyem ê Şîeyan e, Kerbelayê şînê digirin, herwiha serdana birayê wî Ebû Fezil Ebbas jî dikin. **Nerina Azad**

Di şeş mehan de 5 milyon geştyaran serdana Herêma Kurdistanê kirine

Seroka Desteya Geştûguzariyê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê Emel Celal ragihand, pêşbînî dikin ku hejmara geştyaran heta dawîya salê bilindtir bibe.



Seroka Desteya Geştûguzariyê Emel Celal ji Kurdistan24ê re ragihand, hejmara geştyarên ku di şeş mehên destpêkê yênsal de serdana Herêma Kurdistanê kirine, nêzîkî pênc milyon geştyar bû û pêşbînî dikin ku heta dawîya salê, ev hejmar bigihe heşt milyon geştyaran.

Emel Celal diyar kir, armanca Desteya Geştûguzariyê tenê rakişandina geştyaran nîne, di heman demê de berfirekîna çavkaniyên geştûguzariyê ye jî.

Di nava sê salên borî de ji ber sedemên belavbûna vîrusa Koronayê û proseya xweparastina ji wê nexweşiyê, liv û tevgera geştyariyê li Herêma Kurdistanê kêmbû, piştî rakirina rêkarên xweparastinê û kêmbûna rêjeya pêketiyên vîrusa nexweşiyê, sektora geştyariyê cardin vedije û geştyar berê xwe didin Herêma Kurdistanê.

Nerina Azad

Li Qersê cotkaran dest bi dirûna ceh kir

Li navçeya Qamûşanê ya Qersê cotkar him bi makîneyan û him jî bi edetên ji bav û kalan mane ceh diçin. Cotkarên Qersê berî 4 mehan ceh û genim çandibûn.



Niha jî dema dirûnê ye û pale demjimêrên zû yênsibehê berê xwe didin nav van zeviyên. Alîkarê Serokê Odeya Çandîya Qersê Nazım Oncu got: "Ez hêvî dikim îsal ji bo bajarê me û welatî û cotkarên me saleke bi berekt be û ji Xwedê daxwaz dikim ev prose bê qeza û bela derbas bibe."

Hemû jî di bin vî germayê de dşxebitin û Xweda hêzê bide wan." Cotkar di bin germahiya 35 pile de heta êvarê dixebitin.

Cotkar ji germahiya zêde aciz in lê ji encama ked û zehmeta xwe dilxweş in. Cotkar Serkan Çamlî jî got, "Spas ji bo Xwedê saleke bibereket bû. Baran di serdema berhemê de bariya û vî yekê sûdeke zêde da me. Berhem bibereket e lê ji ber germayê hinek pirsgirêkên me hene."

Weke mirovan teyr û tilûrên bajar jî ji berhemê cotkaran risqê xwe dixwin.

Serkan Çamlî herwiha got, "Dema em berhemê xwe radikin legleg, qijik û kevok jî para xwe ji wê berhema ku dirije kom dikin."

Li gorî Odeya Çandîniyê ya Qersê îsal ceh li parêzgehê bi rêjeya ji sedî 20 heta 30 ji sala borî bi berekettir e. Ofîsa Berheman a Tirkîyeyê (TMO) jî îsal tonêk ceh bi 7 hezar û 100 lîre wate 262 dolaran ji cotkaran dikire. Piraniya cotkarên Bakurê Kurdistan û Tirkîyeyê ji ber zêdebûna xerciyên bi taybetî bihabûna sotmeniyê dinalin û dibêjin berhemê wan çiqasî baş jî be ew ji heq nayên der.

Rûdaw

Mesrûr Barzanî: Ji bo pêşerojê, em Kurdistanê pêşketî û welatekî avedan dixwazin

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî pîrozbahî li xwendekarên yekem ên Kurdistanê kir û hêviya bextewerî û serkeftinê di hemû qonaxên jiyana yênsal de ji bo wan xwast.

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî di merasîma xelatkirina xwendekarên yekem ên Kurdistanê de gotarek pêşkêş kir û got: "Ez destxweşiyê li we dikim ku hûn vî qonaxa xwendina xwe bi serkeftî bidawî dikin û gav ber bi xwendina zanîngehê ve davêjin. Di hemû qonaxên pêşerojê yênsal we de bextewarî û serkeftinê ji we re dixwazim."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî got, ew xwe bextewer dibîne û cihê şanaziyê ye ku îro di nav vî hejmara xwendekarên jêhatî de ye û got: "Ez hê bêtir kêfxweş im ku xwendekarên yekem ên Kerkûka dilê Kurdistanê bi me re beşdar in."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî her wiha spasiya dayîk û bav û xizmên xwendekaran kir ku piştgirî û alîkariya wan kirine.

Mesrûr Barzanî tekezî li ser wê yekê kir ku sektora perwerdeyê ji bo wî û Encûmena Wezîran giringiyeke wê ya mezin heye û got: "Me di rewşên dijwar ên wekî vîrusa Korona û di rewşên dijwar ên aborî û darayî de hewl da ku çî ji destê me bê bikin, da ku ev sektor berdewam be."

Derbarê sektora perwerdehiyê de jî, Serokê Hikûmetê Mesrûr Barzanî got: "Destxweşiyê li Wezaretê Perwerde û bi taybet Wezîrê Perwerdeyê Alan Hama Seîd û hemû mamoste û kar-

mendên vî sektorê dikin ku ev qonaxa dijwar derbas kirin û dest jê bernedan."

Herwiha Mesrûr Barzanî got: "Mamostayên me tevî ked û

kiriye."

Herwiha got: "Bi taybetî ji bilî hînkirina zanistê, ez tekezî li ser giringiya perwerdeyê dikim, perwerdeya nifşên paşerojê û endamên



xebata xwe, hertim bûne nimûneya xweragiriya di civaka me de û li gel hemû zehmetiyan jî ji sengerê pîroz ê perwerdeyê derneketin û ev helwest her dem cihê spasî û pêzanîne ye."

Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî got: "Nêrîneke me ya zelal ji bo pêşeroja Herêma Kurdistanê di hemû waran de heye. Ji bo pêşerojê, em Kurdistanê pêşketî û xwedî aboriyeke pîr-reng, çandîniyeke pêşketî, jîngeheke paqij û niştimanek avedan dixwazin. Em welatekî xwedî binesaziyek xurt, welatekî aram û her kes di nav bextewarî, rûmet û aramiyê de bijî dixwazin. Lê ez dizanim bêtir sistemê perwerdehiyê ya bihêz ev dijwar in, ji ber vî yekê min her dem tekezî li ser giringiya pêşketina vî warî

civaka me ji baxçeyên zarokan û dibistanan dest pê dike."

Tekezî li ser wê yekê kir, "Eger em dixwazin endamên civaka me di pêşerojê de, hesta welatparêzî û hezkirina gel û axê li cem wan hebe, divê em vî perwerdeyê li dibistanan bidin destpêkirin."

Mesrûr Barzanî diyar kir: "Ez hertim bi şandeyên welatên ku di vî warî de xwedî ezmûnên serkeftî ne re diaxivim û tekezî li ser hevkarîya di vî warî de dikim û ji ezmûna wan sîd werdigirim."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî tekez kir: "Bi piştevanî û beşdariya aktîv a aliyên peywendîdar, emê hewl bidin ku di vî warî de gavên pratîkî bavêjin, ji ber ku li gorî min perwerdekirina mirovan û şiyarên wan, bîngeha hemû serkeftin û pêşketinê din e." **KDP.info**

Heseke: Ji ber krîza avê, nebûna elektrîkê û germa dijwar xelk dinalîn



Li bajarê Heseke yê Rojavayê Kurdistanê krîza kêmbûna avê hêj berdewam e. Piştî tanker tankên nav taxan teji av dikin, xelkê bajêr bi galon û bîdonan avê ji wan vediguhêzin malên xwe.

Nişteciya Heseke, Heyat Hemmûd ji ber nebûna avê gilî û gazinan dike û dibêje, "Av nîne, pileya germê 42 derbas kiriye. Em ji ber germê dimirin, tevî em 60 salî ne avê jî vediguhêzin."

Kedkar jî li ber tava dijwar a rojê barê genim vediguhêzin.

Lewra ji ber kêmbûna avê û nebûna elektrîkê xelkê Heseke bi kom berê xwe dane kargeha bûzê daku xwe hênik bikin.

Kedkarê bi navê Mihemed Ehmed dibêje: "Em ji ber pileyên zêde yênsal germê dinalin. Em ji sibehê heta êvarê li ber tavê kar dikin, karê me vala ye, ji ber dolar her tişt giran bûye. Em neçar in vî karî bikin daku mal-

batên xwe xwedî bikin, eger em kar nekin em najîn, rewş zêde zehmet e."

Li nav dibistan û stargehan jî tevî derd û êşên derbiderbûnê, koçberên Serê Kaniyê ji ber nebûna elektrîkê dinalîn.

Koçberê Serê Kaniyê, Ebdulezîz Îsa dibêje: "Ev rewşa me ye, zarok nikarin li nav odeyan bimînin, ji ber germa zêde diçin derve dilîzin, tu bi çavê xwe dibîne germa li hundir çiqasî zêde ye, ez Xwedanê paqij dikim, ji ber germê jî em bûzê dikirin."

Ji payîza 2019an ve, piştî dagîrkirina navçeya Serê Kaniyê ji aliyê Tirkîyê ve, zêdeyî yek milyon kes li bajarê Heseke û derdorê jî ber qutkirina ava Santrala Ellok di krîzeke bê mînak a avê de dijîn, bi taybetî di demsala havînê de. **Rûdaw**

Serokê Herêma Kurdistanê sersaxiyê li Fransayê dike

Serokê Herêma Kurdistanê di peyamekê de ji ber canjidedtdana serbazekî hêzên Fransî li Iraqê, peyama sersaxiyê arasteyî Emmanuel Macron û malbata ser-

tevahiya terorê piştgirî û alîkariyê pêşkêşî bi Iraq û Herêma Kurdistanê dikin û heta niha jî li ser erkê xwe ne."

Pêştir Wezaretê Hêzên Çekdar



bazê Fransî kir.

Di peyama Serokê Herêma Kurdistanê de hatiye diyarkirin: "Gelê Kurdistanê piştgirî û alîkariya hêzên leşkerî yên Fransayê, di çarçoveya Hevpeymaniya Navdewletî ya li dijî DAIŞê da, bilind dinirxîne ku, ji bo jinavbirina

ên Fransayê di daxuyaniyekê de eşkere kiribû, efsêrê bi navê Baptiste Gauchot, otomobîla wî ji rê derketiye û bi giranî birîndar bûye. Herwiha diyar kiriye ku li nexweşxaneyê Hewlêrê neştergerî ji bo wî hatiye kirin, lê belê ji ber giraniya birîna xwe, canê xwe ji dest daye.

Peyama Serokê Herêma Kurdistanê wiha ye:

Ez sersaxiyên xwe pêşkêşî malbat û kesûkarên leşkerê Fransî Baptiste Gauchot dikim ku, di nava hêzên Hevpeymaniya Navdewletî ya li dijî DAIŞê da li ser erkê xwe bû û mixabin, derengiya şeva borî ji egerê qeza trafikê jiyana xwe ji dest da.

Ez, di vê dema dijwar da, ji malbatên wan, Serok Macron, gel û hikûmeta Fransayê re sersaxiyê dixwazim û hevsoz û hevsemê wan im. Ez ji Xwedayê mezin dixwazim canê rehmetî bi behîştê şad bike û hedar û aramiyê bi hemûyan bibexşe. Ji hevkarê wî yê ku di heman bûyerê de birîndar bûbû re şîfayê dixwazim.

Gelê Kurdistanê piştgirî û alîkariya hêzên leşkerî yên Fransayê, di çarçoveya Hevpeymaniya Navdewletî ya li dijî DAIŞê da, bilind dinirxîne ku, ji bo jinavbirina tevahiya terorê piştgirî û alîkariyê pêşkêşî bi Iraq û Herêma Kurdistanê dikin û heta niha jî li ser erkê xwe ne.

Nêçîrvan Barzanî
Serokê Herêma Kurdistanê

Li Rojhilatê Kurdistanê 6 kes, li Îranê jî 9 jin hatin desteserkirin

Li Rojhilatê Kurdistanê 6 kes, li bakurê Îranê jî 9 çalakvanên jin hatin desteserkirin.

Her ku salvegera salvegera canjidedtdana Jîna Emîniyê nêzik dibe li Îran û Rojhilatê Kurdistanê girtin û desteserkirina xelkê jî zêde dibe.

Li gorî agahiyên ku rêxistinên mafên mirovan belav kirine li bajarên Şîno û Mehabadê yên Rojhilatê Kurdistanê 6 kes û li bakurê Îranê jî 9 çalakvanên jin hatine desteserkirin.

Tora Mafên Mirovan a Kurdistanê ragihand ku doh 3 şênîyên gundê Gogtepeyê yê Mehabadê ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatine desteserkirin.

Li gorî heman çavkaniyê, biryara dadî ya hêzên ewlehiyê ya girtina wan kesan nebûye û wan hêzan negotiye ka ji ber çî tîn desteserkirin. Dîsa doh li gundê Bênzurtê yê bajarê Şînoyê, 2 welatî hatine desteserkirin.

15ê Tebaxê jî li bajarê Mehabadê welatîyekî bi navê Hîwa Şebaheng hatiye desteserkirin.

Nayê zanîn bê hêzên ewlehiyê Hîwa Şebaheng biriyê kû derê.

Herî kêm 9 çalakvanên jin hatine desteserkirin

Navenda Ragihandinê ya Çalakvanên Jin a Îranê (Bîdarzenî) jî ragihand ku doh herî kêm 9 çalakvanên jin ji aliyê hêzên ewlehiyê yên parêzgeha Gilanê ve hatine desteserkirin.

Jinên ku hatine desteserkirin hem di çalakiyên ji bo jinan de hem jî di gelek warên din de çalak in.

Bîdarzeniyê herwiha da zanîn

ku di nav wan jinan de helbestvan, graffiker û wênegir jî hene.

Heta niha nayê zanîn bê kîjan

Li gorî raporên ku hatine belavkirin, guşara hêzên ewlehiyê ya li ser xizmên kuştîyên



aliyê ewlehiyê, bi çî tohmete ew çalakvanên jin desteser kirine.

Herwiha behsa desteserkirina jineke din jî tê kirin û eger ev yek jî bê piştrastkirin dê hejmara jinên desteserkirî bibe 10.

Guşara li ser xwendekaran zêde bûye

Encûmena Pişeyî ya Xwendekarên Îranê bal kişande ser salvegera xwepêşandanên Jîna Emîniyê û got:

"Bi nêzîkbûna salvegera nerazîbûn û xwepêşandan re li zanîngehên cuda guşara li ser xwendekaran zêde bûye.

Hêzên ewlehiyê bangî bi dehan xwendekaran kiriye daku biçine navendên ewlehiyê û gef li wan hatiye xwarin."

"Guşara li ser xizmên kuştîyan zêde bûye"

xwepêşandanên sala borî jî zêde bûye.

Hêzên ewlehiyê dixwazin xizmên kuştîyan bédeng bin herwiha ji bo kuştîyên xwe ti merasîman li dar nexin.

Jîna Emîni

Keça Kurd Jîna Emîniyê 16ê Îlona 2022yan li nexweşxaneyê Tehranê canê xwe ji dest da.

Jîna Emîni ji aliyê Polîsên Exlaqî yên Tehranê ve hatibû desteserkirin.

Canjidedtdana wê bû sedema nerazîbûnên zêde û li tevahiya Rojhilatê Kurdistanê û Îranê xwepêşandan hatin kirin.

Di van xwepêşandan de bi sedan kes ji aliyê hêzên Îranê ve hatin kuştin.

Herwiha gelek kes hatin girtin û birîndarkirin. **rudaw.net**

Mesrûr Barzanî: Bi seredana taxên bajêrê Duhokê gelekî dilxweş bûm

Iro Duşema 14ê Tebaxa 2023an Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî serdana



parêzgeha Duhokê kir û ji nêzîk ve guhdarî daxwazên xelkê taxên wî bajarî kir.

Mesrûr Barzanî ragihand: "Gelek dilxweş bûm ku min îro seredana çend taxên bajêrê Duhokê kir û guhdariya gilî û daxwaziyan hevvelatîyan kir. Pêwîst e dezgehên hikûmetê bi yeksanî xizmetguzariya pêşkêşî hevniştîmanîyan bikin û cudahiya di nav çî tax û devera de nekin û erkê serekî yê berpirsan, xizmetkirina xelkê Kurdistanê ye." **KDP.info**

Li Urmîyeyê hişyariya lehiyê: 'Nêzîkî çeman mebin'

Rêveberiya Keşnasiyê ya Urmîyeyê hişyariyê dide ku dê ji ber baraneke gur lehî rabe û ji welatîyan xwest ku nêzîkî çeman nebin.



Rêveberê Rêveberiya Keşnasiyê ya Urmîyeyê Mehdî Sabîrî ragihand ku pêleke xurt a baranê dê parêzgehê bide ber xwe.

Mehdî Sabîrî ji ber vê yekê jî ji welatîyan xwest ku nêzîkî çem û avan nebin û ji wan dûr bikevin.

Mehdî Sabîrî herwiha diyar kir ku ji êvara îne ve bayekî xurt li seranserê parêzgeha Urmîyeyê ya Rojhilatê Kurdistanê tê û li piraniya navçeyan esman ewravî ye.

Mehdî Sabîrî destnîşan kir ku pêla barana xurt heta êvara roja yekşemê dê berdeham bike û dê pileyên germahiyê ji 40 pileyî dakevin 20 pileyî.

Rêveberiya Keşnasiyê ya Urmîyeyê diyar kir ku li navçeyên çiyayî jî pileya germahiyê dê 12 pileyan dakeve. **Nerina Azad**

Li Wanê meş û çalakî 2 rojan qedexe ne

Li parêzgeha Wanê bi biryara parêzgarîyê meş, çalakî û civînên bikom ên li derve 2 rojan hatin qedexekirin. Parêzgarîya Wanê derbarê qedexekirina çalakiyan de li ser malpera xwe ya fermî daxuyaniyek belav kir.



Parêzgarîyê di daxuyaniya xwe de got: "Îro û sibe meş, çalakî, kampanyayên înzeyan, çêkirina anketan, vedana kon û standan, daxuyaniyên çapemeniyê, belavkirina belavokan, xwepêşandan, çalakiyên rûniştinê û civînên bikom ên li derve 2 rojan hatine qedexekirin.

Parêzgarîya Wanê îdia dike ku qedexa "ji bo rêgirtina li ber êrîşan", "parastina can û malê welatîyan", "jinavbirina rêxistinên terorê" û "pêkanîna ewlehiya niştîmanî" hatiye ragihandin. Çalakiyên bi destûra parêzgarîyê serbest in Li gorî daxuyaniyê, qedexa wan çalakiyan li xwe nagire ku bi destûra parêzgarîyê ne. Li Wanê çend hefte ne bi berde-wamî rojên şemî û yekşemê bi biryara parêzgarîyê lîdarxistina çalakiyan tê qedexekirin. **Nerina Azad**

Serok Barzanî li gel wezîr û parlementerên PDK li Bexdayê civiya

Li Selahedîn Serok Barzanî li gel wezîr û endamên Fraksiyona Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) li Parlamentoya Iraqê û berpîrsên PDKê li Bexdayê civiya.

Di civînê de rewşa siyasî û pêşatên dawî hatin gotûbêjkirin.

Di vê hevdîtinê de, Dr Fuad Husên Wezîrê Derve û Endamê Mekteba Siyasî, nêrînek li ser amadekariyên hîlbijartinên encumenên parêzgehan û giringtîrîn yasayên ku dê di vê demsalê de bên gotûbêjkirin, pêşkêş kir û ji wan jî yasaya petrol û gazê.

Li dirêjahiya axaftina xwe de Serok Barzanî balkişand li ser wê yekê ku me pirseke rewşa heye û em hertim pabend in bi sê pîrensîpên tawafûq û hevkeşe û hevsengiyê di hemû qonaxên proseya siyasî de.

rojvakurd.com

Penaberên ji Rojavayê Kurdistanê dixwazin Herêma Kurdistanê pêş ve bibin

Li Kampa Giwêlanê ya navçeya Kelekê ya Duhokê cotkarên penaber ên Rojavayê Kurdistanê ji bo debara jiyana xwe li nêzî kampa ku lê dimînin zevî kirê kirine çandiniyê dikin.

Cotkarên Rojavayê Kurdistanê li Herêma Kurdistanê ji bo zêdekirina berhemên çandiniyê yên herêmê jî dibin alîkar.



Cotkar dibêjin eger hikûmeta Herêma Kurdistanê piştgiyê bide wan, dê bêtir sûdê bigihînin çandiniya herêmê.

Cotkar Efrînî Mihened Xelîl got "Em bi xwe berê li Sûriyeyê cotkar bûn. Sûriye xerab bû me zevî, mal, motorên xwe gişt di cih de hiştin em reviyên hatin vê derê.

Li vê derê jî kar tine. Mirovên wekî min bi temen nikare kar bike. min bihîst ku Kurdistan bi xwe pêwîstiya xwe bi keskayî heye. Erdê xwe ava xwe pir e. Em dixwazin feydeyekê li Hikûmeta Herêmê bikin."

Ew gelek corên keskayê yên wek îsot, bacan, garis diçînin lê beşê herî zêde ji çandiniya wan miloxiyê ye.

Cotkarê ji Kobaniyê Bozan Kereo diyar kir "Em fikirin me got em çandiniya miloxiyê bikin. Me çandiniya miloxiyê kir. Kar tine ka emê çî bikin. Me seyare kirê kiriye, em pê dibin Hewlêr, Behirke, Kesnezan, em dibin her derî."

Di nav her baxçeyekî de nêzîkî 10 karker kar dikin.

Cotkar dibêjin, ew piştevanîyê ji ti kesî wernagirin lê eger Hikûmeta Herêma Kurdistanê piştgiyê wan bike wê çandiniya wan baştir bibe û bikaribin berhemên zêdetir biçînin.

Herwiha cotkar dibêjin dê karker jî zêde bibin, wê demê dê bikaribin behemên xwe ji bo welatên derve jî bişînin.

Piraniya van cotkaran xelkê herêmên Efrîn û Kobanê yên Rojavayê Kurdistanê ne, li kampa Giwêlan ya li parêzgeha Duhokê dimînin, gelek ji wan heman kar li Rojavayê Kurdistanê dikirin.

Rûdaw

Mesrûr Barzanî hevxiyê xwe bo hikûmet û xelkê Fransayê nîşan da

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî hevxiyê xwe bo hikûmet û xelkê Fransayê nîşan da, ji ber canjîdestdana efserekî wan ê serbazî li Iraqê, herwiha hêviya başbûna bilez ji bo serbazê din ê birîndar xwest.

Şeva Înê 18ê Tebaxa 2023an, Serokê Fransayê Emmanuel Macron ragihand: "Serbazekî Fransî li Iraqê di bûyereke trafikê de canê xwe ji dest da, dema bi erkê xwe yê rahênankirina hêzên çekdar ên Iraqê ve mijûl bû." Herwiha Wezareta Hêzên Çekdar ên Fransayê jî ragihand, di wê bûyerê de efserekî din ê serbazî yê Fransayê bi giranî birîndar bûye û li nexweşxaneyê serbazî ya Bexdayê tê tedawîkirin.

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî îro Şemiyê 19ê Tebaxa 2023an di peyamekê de ku li ser medyaya civakî ya Xê (Twittera berê) ragihand: "Em ligel hikûmet û xelkê Fransayê beşdar in di matemîna raîd Baptiste Gauchot, ku di bûyereke trafikê de li nêzîkî Hewlêrê canê xwe ji dest da." Mesrûr Barzanî di beşeke din a



peyama xwe de diyar kir: "Di vê dema diltezîne de bîra me li cem malbata wî ye. Herwiha em duaya başbûna bilez ji bo serbazê din ê birîndar dikin."

Nerina Azad

Sekreterê PDK-Sê: PYD diyaloga Kurdî asteng dike û bawerîya wê bi hevbeşiyê nîne

Sekretêrê PDK-Sê careke din PYDê bi astengkirina danûstandinên Kurdî- Kurdî tometbar dike û radighîne, ji bo vegera nav danûstandinan, ti fişareke pêwîst ji aliyê Amerîka ve li ser PYDê nîne.

Sekretêrê Partiya Demokrat a Kurdistan- Sûriyê (PDK-S) Mihemed Ismaîl di hevpeyvînekê ligel rojnameya fermî ya partiya xwe "Kurdistan" de derbarê danûstandinên Kurdî - Kurdî de ragihand, "Diyaloga Kurdî - Kurdî gaveke girîng bû û gelê Kurd yê ku li aramiyê digere bi giringî lê dinêre ji bo ku atmosfereke erênî yekrêzî û yekhelwestiya Kurd peyda bibe. Tiştê erênî ew e ku aliyê Amerîkî wek gerentor e û rêkeftina Duhokê bingeha wê ye û ji ber hebûna aliyê Amerîkî, gaveke baş hat avêtin. Lê PYDê astengî derxistin, ta ku danûstandin neçin serî."

Mihemed Îsmaîl got jî: "PYDê nebûna nûnerên dîplomatîk ên Amerîkî li herêmê û veguhastina desthilatê li Washingtonê ji Komariyan bo Demokratîtan wek derfet dît û di wan sê mehên destpêkê de hewla şewitandina ofîsên partiyên Kurdî da û kadroyên wan



girtin û daxuyanî li dijî serkirdeyên ENKSê avêtin ta ku danûstandinan têk bide." Diyar kir jî: "Piştî hewlên Amerîkîyan a dubare destpêkirina diyalogê, ENKSê belgeyek garantî ji şeş xalan pêşkêş kir ku aliyê Amerîka û birêz Mazlûm Ebdî wek garantorê PYDê jî ew pejirandin û li ser îmze kirin, lê wan nekarîn aliyê din (PYD) bînin ser maseya danûstandinan."

Sekretêrê PDK-Sê got jî: "Hîn jî aliyê Amerîkî danûstandinê ligel aliyên pêwendîdar dike, lê fişareke pêwîst nîne ku wan neçar bike ku

rêkeftinê bipejirînin, ji ber ku PYD rêkeftin û hevbeşiyê bi aliyekî Kurdî re qebûl nake û bawerîya wê pê tune ye."


Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) û Partiyên Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdî (PYNK) ji Mijdara 2019'an ve bi piştgiyê Amerîka, Herêma Kurdistanê û HSDê dest bi danûstandinên yekrêziya kurdî û beşdariya ENKSê di nava Rêveberîya rojavayê Kurdistanê de kiribûn, lê ev danûstandin piştî nêzîkî salekê û bêyî gihîştina ti peymanekê rawestiyane.

Nerina Azad

Ez bi pirtûka nû ya yekem ya xanima dengbêj, rewşenbîr û çeleng

Ez bi pirtûka nû ya yekem ya xanima dengbêj, rewşenbîr û çeleng - Aslîka Qadir bi navê "Walatê Me Kurdistan e" gelek kêfxweş bûm. Zêdetir salek e ku pirtûk ji bo çapkirinê hatibû amade kirin. Bi qasî ku ez dizanim pirtûka bîranîname, herwiha mirov dikare bêje pirtûk roman e, çîrokên ku di jiyana rast de qewimiye tê vegotin, tê de bîranînen hunermenda delal, li ser jiyana wê ya kesane, dîtinên wê yên li ser bûyeran 50-60 sal berê, li ser bingeha bûyerên rastîn bi êşkere, her tişt bi dilsozî hatî nivîsandin. Ji pirtûkê em hînî gelek rastiyên balkêş û nenas ji jiyana kesayetiyên navdar ên rewşenbîriya kurdên Ermenistanê dibin. Hêjayî gotinê ye ku bi piranî ew bi xwe şahideya bûyeran bû ye. Berga pirtûkê pir bi kalîte ye, ji 416 rûpelan pêk tê, texmîn dikim ku naveroka pirtûkê jî pir balkêş e, bi qasî ku ez dizanim tê de gelek wêneyên kevnar hatine weşandin.

Ez dixwazim bêjim ev pirtûka yekem e ku di qada piştî Sovyetê de ji hêla jinekê ve hatî nivîsandin, ev yekem ezmûna wê ya nivîsandina pirtûkê ye. Aslîka xanim careke din ez te ji dil pîroz dikim, bawer im xwendevan dê berhema te begem bikin, ez li hêviya



www.avestakitap.com

xwendina pirtûka te me. Spas ji bo weşanxaneyê Avêstîyê û hemû kesên ku keda wan di çapkirina vê pirtûkê de heye.

Pêwîste xizmeta zêdetir ji bo welatiyan were kirin

Serok Barzanî ligel hemû çînen devera Akrê civiya û ragihand, pêwîst

Akrê kir û li baregeha Liqa 9 a Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) ji aliyê



e bêyî ciyawazî xizmeta zêdetir ji bo welatiyan were kirin û herwiha ragihand, Hikûmeta Herêma Kurdistanê kar dike ji bo xizmetê ji hemû navçeyên Herêma Kurdistanê bike û xizmetguzariya zêdetir ji bo welatiyan dabîn bike.

Serok Barzanî serdana qezaya

berpîrsên PDKê û hikûmetê yê navçeyê ve pêşwaziyê germ lê hate kirin.

Baregeha Barzanî ragihand, Serok Barzanî li qezaya Akrê di civîneke berfireh de bi beşdariya çînen cuda û kesûkarên serbilind ên şehîdan, astengdarên şer, tekoşerên wî sînori,

mamosta, kesayetên olî, kasibkar, cotkar, ciwan û jinan re civiya.

Serok Barzanî di gotareke ji bo amadebûyên civînê de bal kişand ser xizmetkirina ji deverê bi giştî û amaje bi wê yekê jî kir ku pêwîst e bêyî ciyawazî xizmeta zêdetir ji welatiyan re bê kirin û diyar kir, Hikûmeta Herêma Kurdistanê kar dike ji bo xizmetê ji hemû navçeyên Herêma Kurdistanê bike û xizmetguzariya zêdetir ji bo welatiyan dabîn bike.

